A.M.Behnam



# BONA HEVALBENDÊN MIN YÊN MISILMAN BI XOŞEWÎSTÎ

**Pêşgotin**

Bi salan e gellekî imtiyaza min bû ku him li welatê xwe Misirê him jî li Emerîka, di derbarê baweriyê de, bi hevalên xweyî Misilman re bikarîbim bi hevaltî biaxifim. Ev axaftinên me tu carî nezîvirîn ku bibin nîqaşên tund, lê li dijraberî her tim di bin bana hurmeta bigerewî de pêk hate. Hemiyên van axaftinan bi awayekî pirsên bi nazikî hatine pirsîn û bersivên jî bi heman nazikî hatine dayîn derbas bûn. Bi vî awayî derfeta me bû ku bêyî dilmayîn em li ser pirsgirêkên li ser cihêtiya baweriyê avabûne biaxifin.

Ev risaleta li ser mijarên ji Misilmana re bûye tilpekî bûn û bala min kişandine hate holê. Bo vê yekê ez sipasiyên xwe pêşkêşî hevalên ku beşdarî axaftina mijaran bûne dikim û hêvî dikim ku ev pirtûk alîkariyê bi her kesê ku li rasteqîniyê digerin re bike...

A M B

Tebax 2004



# Destpêk

Xrîstiyanî û Îslam du olên mezin ên cîhanê ne. Her yek dibêje "ez rast im" û "ez ji Afirkirê ezman û erdan afirandiye û dijî û zindî ye hatime". Lê heyf û mixabîn gellek kesên ku endamê van olan in, di derbarê baweriya yê din de ya qet ne an jî piçekî xwedî agahî ye. Yekî wisa gotiye: "Li Misirê- cihê ku Misilman û xirîstiyan tevek di nava harmoniyekê de lê dijîn, xeynî zanîna; Misilman difikirin ku Xrîstiyan jiyana pirrjinî qedexe kirine û goştê berazan dixwin, Xrîstiyan jî difikirin ku Misilmanan goştê berazan qedexe kirine û jiyanek bi pirrjinî dijîn; di derbarên hev de agahiyek bi kûranî nîne..." Bo vê yekê, bi rastî mijarên olî pev re neaxifîn dê gellek hêsanî bikarîbin bibin cîranên qenc, hevkarên qenc û hevalbendên qenc.

Çawa wekî Xrîstiyaneke li Misirê mezin bûme û di tevahiya 28 salên ku li wê jiya me, gellek hevalên min ên Misilman ên ku hevaltiya wan min şaş û metal kiriye bûne. Û ez dikarim bibêjim tuyî jî ji ber Xrîstiyan bûna min ne kêm dît ne daraz kir. Ev gotinên min 50 sal berê bûn. Min dixwest ku rewş hê wusa ye, lê di van demên dawîn de pêşveçûnên neqenc, bandorê li ser têkiliya di navbera endamên her du alî jî kir. Bi taybet jî ji her du alî jî hinek waiz û rêvebir hîna bêbextiyan avitin hustiyê hev, di navbera her du alî de jî bêtahmî û pêneewletî afirand.

Li aliyekê çawa mirov dilsozê baweriya xwe be tiştekî qenc di ser de hê jî ferz be û li aliyê din xerabî kirina baweriya keseki din ne li cih e.

Waizek hînkirinê di mijarên ku bingeha baweriyê pêk tînin de bike û hînkariyên li dijî Kitêba Pîroz in birizîne, dê were qebûl kirin lê derkeve telewizyonan û bi zimanekî êrîşkar biaxife, dê neyê qebûl kirin. Di vê mînwalê de melayek dikare ji civaka xwe ve bixwaze ku dilsozê hînkariyên Quranê bin, lê belê bi mikrofonekê û bi dengekî bilind ku Xrîstiyan ji dikarin bibihîzin ji wan re bibêje "Kafir" dê neyê qebûl kirin, ne rast e. Kirinên wisa, ji bilî ku kesên nû tevlî her du alî bibin, dê girr û kerihandinên di nava kesên endamê her du civakê ne zêdetir bike û wan ber ve li dijî hev sûckirinê ji bibe.

Kitêba Pîroz, mînakên qenc dide me ku ka em ê bi mirovên wekî din re çawa têkevin têkiliyê. Divê em li hemberî wan ne êrîşker û şikîner bin, li dijî wê tenê Mizgîniyê bibêjin. Şagirt Pawlos sê salên ku li Efesê maye, dema mizgîniya xelasbûnê dianî zimên, ji kesên ku ji netewên pûtperestin re ne gazinc û heqaretê kir, ne jî ji Dianaya (Artemîsa Efesê) ilaheya wan ya sexte a ku ji xwe re kirine senem re gotineke xerab kir. Lê dîsa jî nivîskarên şaredariyan ketin navê û kesên ku ji axaftinên Pawlos xoşnûd nebûne û tevlî heviyê derdixînin, aş kirin û tesdîq kirin ku Pawlos gotineke xerab nekiriye. Ev bûyer di beşa Karên Şagirtan, birra 19'an, ayeta 37'an de nivîsandiye. Pawlos ne li Asyaya biçûk (Li Tirkiyeya niha) ne jî li raya gelemperî (eşkereti) ya Ewropa de li dijî olên sexte neaxifî. Lê li dijî vê yekê her tim rastiyê digot û bona ku yên dibihîzin mizgîniya xelasiyê qebûl bikin dua dikir. Ez jî dixwazim heman regezan bişopînim. Dixwazim ku, dema tiştên ku bi wan bawerim datînim holê xwendekar gotinên min ji ber çavan derbas bike û bi xwe biryara xwe bide. Xwedê naxwaze mirov li dijî daxwaza xwe olekê dîn qebûl bikin. Ev ne daxwaza Xwedê ye. Û li aliyê din ez dixwazim vê yekê bi ruhê hezkirinê ve bikim. Bo wê yekê vê pirtûkê bi navê "Bona hevalbendên min yên Misilman bi xoşewistî" diweşînim. Ji ber ku van mijarana hew bi hevalbendiyê, bêyî şikandina hev û tarûmar kirina hestan, bi hevaltiyê biaxifin. Ez gellek rûmetê didim hevalên xwe yên Misilman ên di hevaltiya wan de dilsoz im û heyranî kesayetiya wan ya exlaqî me... Sedemeke din a nivîsandina min ya vana jî ev e... Derfetên min çêbûn ku ez bi gellekên wan re mijarên giring ên di derheqê baweriyê de ne, bi hevaltiyê axifim. Armanca vê risaletê ew e ku hînkariyên giring ên Kitêba Pîroz, yên ku ji aliyê Misilmanên rasteqîn ve xelet hatine fêm kirin an jî bona wan mîna kufrekê ne, bêne daxuyanî kirin.

*"Hezkirin tu carî dawî nabe"* (Încîl, 1.Korîntiyan 13:8)

# 1. KITÊBA PÎROZ

## Nêrîna Giştî

Kitêba Pîroz ji du beşî pêk tê: Peymana Kevin û Peymana Nû

### Peymana Kevin

Peymana Kevin ya berî ku Îsa Mesîh dakeve rûyê erdê, ji aliyê gellek mirovên Xwedê ve hatiye nivîsandin, bi pênc pirtûkan, ên ku Mûsa Peyxamber nivîsandine destpê dike. Kitêba pêşiyê, Afirandin ya ku destpêk û rehê her tiştî tîne zimên e. Kitêb bi ayetên; "Di destpêkê de Xwedê erd û ezmanan afirand" dest pê dike. Afirandina mirovahiyê, hatina gunehê a bi rûyê erdê ve çawa hatiye û di dema Nûh de çawa bi lezî belav bûyiye û bi vî awayî çawa hewcedariya tofanekê kiriye, çawa netewe û ziman derketine holê û bang kirina Brahîm tîne ziman. Bi mirina Ûsiv ya li Misirê û destpêkirina jiyana Lawên Îsraêl a li Misirê dawî dibe.

Navê pirtûka duyemîn Ji Misirê Derketin e. Bûyerên piştî mirina Ûsiv bûyîne û Lawên Îsraêl ka çawa li Misirê kirine dîl û di bin rêvebirina Mûsa ka çawa ji Misirê derketine tîne ziman. Pirtûkên sêyem, çarem û pêncemîn jiyana çolê ya Îsraêliyan dibêje. Pirtûka pêncan bi mirina Mûsa yê ku piştî jiyana çolê, wan heta sînorê warê Kenanê aniye, dawî dibe.



Piştî van her pênc pirtûkên ku bi navê "Tewratê" jî têne zanîn, pirtûka yekem ya ji donzdeh pirtûkên dîrokî, pirtûka ku bi navê xwe jî tête zanîn, ya Yêşû ê ku lawên Îsraêlê dibe warê Kenanê, didome. Ev pirtûkana; çawa ku Babîliyan Cihûyan ber ve welatê xwe Babîlonê sirgûn dikin û piştî hêsiriyek dirêj çawa mîna komeke biçûk disa vedigerin welatê xwe û him perestgeha ku têkçûye him jî dîwarên bajarê xwe çê dikin, dawî dibin... Ji ber ku bûyerên dîrokî bi awayekî sazûmanî û bi zimanekî sivik, ku her xwendekar têde bigihêjin hatine nivîsandin, di derbarê jiyanên Brahîm, Ûsiv, Mûsa û Dawid de agahî û lêkolînê jî hêsantir dikin.

Hema piştî kitêbên dîrokî, pênc pirtûkên ku bi şêwazeke helbestî hatine nivîsandin û weke kitêbên zanyariyê jî têne binav kirin têne û dom dikin. Vana Pirtûka Eyûb, Pirtûka 150 mezmûrên helbestî û ruhanî ya bi navê Zebûr jî tête zanîn û sê pirtûkên ku Silêman peyxamber nivîsandine, ji vana jî ya herî mezin, pirtûka "Methelokan" e...

Piştî van pirtûkan, pirtûkên 16 peyxamberî, ên ku di navbera salên B.Z. 800-400 hatine nivîsandin û gellekên wan di derbarê Mesîh de ne û di naverokên wan de bi sedan gotinên peyxamberî hene, têne û didomin. Di derbarê, dê Mesîh ji keçikekê bizê, dê li Beytlehemê were dinê, jiyana Wî, mirina Wî, vejîna Wî û ka wê çawa mîna "Qiralê Qiralan" ji nû ve were dinê de agahî tête dayîn.



3

## Peymana Nû (Încîl)

Peymana Nû, piştî ku Îsa Mesîh hilkişiya ezmanan hate nivîsandin. Bi çar pirtûkên ku bi navê çar niviskarî tête zanîn ve dest pê dike. Ji ber vê yekê gellek carî pirsa; "Gelo çima çar Încîl heye, ya herî rasteqîn e kîjan e?" têye pirsîn.

Ev pirtûkên her çar beşên Mizgîniyê ne, peyxama Xwedê ne û her yek, aliyek Mesîh Îsa têdigehînin...

**Di Beşa Meta de** Îsa, wekî Mesîhê ku ji Brahîm re hatiye waad kirin û dê hemî netewe di Wî de werin pîroz kirin, tête danasîn. Xwedê ji Dawid re jî daxuyanî kiribû ku dê Qiraletiya Mesîh ji nava nifşeya wî ve were. Ji ber vê yekê hema di destpêkê de, beşa pêşiyê ya Meta de nifşeya Îsa Mesîh bi Brahîm û Dawid ve tête spartin. Ji aliyê din jî Meta, Îsa mîna kesekî ku bi peyitandinan ve rastiyan dibêje û ji aliyê gelê xwe ve hatiye red kirin dide nasîn. Ji vê yekê wêdetirê, Mesîh mîna kesekî ku di dîshatina xwe de ji aliyê Xwedê ve mîna qiralekî hatiye peywirandin û kesekî ku bi hêz û qudretê ve hatiye xemilandin were û bête qebûl kirin jî dide nasîn. Meta van rasteqîniyan ji gelên Cihû ên ku Mesîh red dikin re, bi gellek mînak dayînên ji Peymana Kevin ve li ber çavan radixîne û dipeyitîne.

**Di Beşa Marqos de** Îsa, wekî xizmetkarekî tête danasîn. Tê gotin ku ne bona jê re xizmet bête kirin, lê bona xizmetê jî



me re bike û bona canê xwe mîna fidyê di oxra me de bide hatiye rûyê erdê. Ji ber vê yekê qal û behsa qeyda kutuka (bêpîr û pergala) ezbeta Wî nayê kirin. Ev beşa ku karên Mesîh hema û di cih de kirinê û çawa mirovan pîroz kiriye dibêje, vegotina şexsiyetê ye.

**Di Beşa Lûqa de** Îsa, mîna Lawê mirov têtê danasin. Tê gotin ku tenê ne bona gelekî, lê bona hemî mirovan hatiye. Ji ber vê yekê Bêpîr û pergala ezbeta Wî heta Ademê bapîrê hemî mirovan e, têtê spartin. Bi wekokên ku tîne zimên dide xuyakirin ku ka dilsoziya Xwedê bi çi awayî digihêje gunehkarê herî xerab yê baweriyê aniye û poşman bûye.

**Di Beşa Yûhena de** Îsa, mîna kesekî ku ji destpêkê ve heye û bi navgîniya Wî her tişt hatine afirandin dide nasîn. Bi kurtayî van her çar beşên Încîlê Mesîh Îsa mîna qiral, xizmetkar, mirov û Xwedê têdigehînin.

Mîna gellek kesê ku bi tevayî dizanin, ji bo Îsa Mesîh ji ezmanan ve Încîlek nehatiye daxistin, lê li dijî vê yekê ev her çar niviskarên ku navên wan li jorê ve derbas dibin ên ku di rêvebiriya Ruhê Pîroz de ne, van her çar beşî nivîsandine. Ji ber vê yekê çavkaniya gotina "Încîla Îsa Mesîh" ew e ku, çawa Xwedê bi navgîniya Îsa Mesîh Mizgîniyê (Încîlê) daye, pêk hatiye.

Piştî van her çar beşên Încîlê, pirtûka Karên Şagirtan tê. Di vê pirtûkê de bi navgîniya şandiyên ku Mesîh Îsa



4

wan şandine; ka çawa nûçeya qenc ya hezkirina Xwedê û xelasiyê, Xrîstiyanî li gellek cih û warê dinê hatiye belav kirin tête gotin. Wan Mizgîniyê ne bi gefxwarinan, zordestiyê, şûr û riman, lê bi fedakarî û ji kesên wekî din re bi xizmetê belav kirin. Li dijî hemî tengasiyên ku kişandine bangî mirovan kirin ku bila ji tariyê vegerin ronahiyê û ji serweriya Îblis vegerin Xwedê.

Piştî Karên Şagirtan 21 name tên. Ji vana re nameyên şandiyan ji têţe gotin. Naveroka vana bona jiyanek li gora daxwaziya Xwedê, hînkariyên girîng û destûrên bi taybet in.

Paşî vana pirtûka Peyxamgirtin ya di Încîlê de pirtûka dawin e û bi giştî di derbarê bûyerên di hatinê de ne tê. Kitêba Pîroz bi gotina afirandina erd û ezmanan destpê dike û bi tarîfkirina erd û ezmana nû ya ku dê were diqede. Kitêba Pîroz di derbarê xwe de wekî peyxam dayîna Xwedê ye şahdeyiyê dike.

*"Hemî Nivîsên Pîroz, peyxamdayîna Xwedê ne û bona perwerdekirina di hînkirin, azirandin, anîna rêya rast û rastiyê de qenc e."* (Încîl 2.Tîmotêyos 3:16)



## Gelo Kitêba Pîroz Hate Guhertin?

Gellek girîng e ku her Misilman bizanibin ka Kitêba Pîroz hatiye guhertin an jî nehatiye guhertin? Quran bi gellek eşkeretî dide xuyanî kirin ku Kitêba Pîroz ji Xwedê ye û divê her yê ku baweriyê anîne vê yekê qebûl bikin. Di Îslamê de şertek ferz e ku bi Kitêbên Xwedê şandine, ên ku berî Quranê hatine dayîn bawerî hebe. Wê gavê ger Kitêba Pîroz nehatiye guhertin, divê her yê Misilman pê baweriyê bînin. Berî her hiştî em li vir çend ayetî bidin nîşandayîn ku ew dibêjin Kitêba Pîroz ji Xwedê ye:

- 5- Maîde 43-48,68.
- 4- Nîsa 136.
- 6- En'am 89,90.
- 28- Kasas 49.

16- Nahl, 43. (Di hedîsên Al Jalal de, gotinên di sûreya Nahl de weke "Ji xwediyê ilmê re bipirsin" dibêje, di derbara yên ku Încîl û Tewratê, yanê Kitêba Pîroz di destên xwe de digirin re hatiye gotin, têtê zimên)

Bona Misilmanek gellek girîng e ku ka bizanibe piştî ku Quran hate nivîsandin, Kitêba Pîroz hatiye guhertin an jî nehatiye guhertin. Ji ayetên ku ji Quranê wekî mînakekê hatine danîn, bi eşkeretî têtê fam kirin; derfet nîne ku Kitêba Pîroz berî Quranê hatibe guhertin, ji ber ku Allah pêşniyara kitabek xelet nedikir.

## Delîlên Ku Kitêba Pîroz Nehatiye Guhertin

**Ya Yekemîn:** Peymana Kevin hema hema ji sedî 75'ê Kitêba Pîroz e û him Kitêba Pîroz ya cihûyan him jî beşa Peymana Kevin ya Kitêba Pîroz a ku Xrîstiyanan jî qebûl kirine yi. Ne mimkûn e ku Cihûyên Xrîstiyaniyê qebûl nekirine, ligel Xrîstiyanan bitûmî wekhev vê Kitêbê biguherin. Jixwe Kitêba Pîroz berî zayîna Îsa Mesîh bi 200 salî bi zimanên Îbranîtî û Aramîtî hatibû nivîsandin. Û wekî din, bi zimanê Yewnanî jî hatibû wergerandin. Ew wergera ku bi navê Septûagînta tête zanîn, heta roja îrojê qet nehate guhertin. Di Kitêba Pîroz de gellek ayet hene ku di derbarê, ji ber ku Cihû bêîman bûn ceza ya Xwedê li xwe heq kirine de ne. Ger Cihûyan karîbana tiştekî biguhertana, ma di pêşiyê de dê van ayetana neguhertana?

**Ya Duyem:** Bi sed salan berî hatina Îslamê, nusxeyên Kitêba Pîroz hebûn. Ji pênc hezarî zêdetir bi Yewnanî û ji deh hezarî zêdetir bi Latînî bestnivîsên (Manûskript) di sedsalên 2. û 3.an de hatine nivîsandin hebûn. Li Misirê, li bakurêrojavaya Îskenderiyê, li başûrê Ahmîmê û li bakurêrojhelata Çiyayê Sînayê, li cihên cuda de nusxeyên bi nivîs, ên ku naverokên wan wekhev in hatine dîtin. Li Newala Qumranê ya ku li bakurêrojavaya Behra Mirî (Gola Lût) di şikeftekê de di sala 1947'an de gellek nivîsên desta hatine dîtin. Vana bi navê "Balorên Behra Mirî" têne nasîn. Naveroka wan, bi Kitêba Pîroz ya ku îroj di destê me deyî wekhev in.



**Ya Sêyem:** Încîl di sedsalên 2. û 3.yan de bi gellek zimanî hatibû wergerandin û li gellek welatên cîhê de bi gellek nusxeyî hebû. Gelo derfet heye ku hemî van nusxeyena ji welatan bidine hev, bînin ba hev û hemiyan biguherin? Tiştekî wisa ne mimkûn e.

**Ya Dawîn:** Ger Xrîstiyanan ji Kitêba Pîroz tiştekî guhertibana, ma dê pêşiyê ayetên dijwar û fêmkariya wan zehmet e neguhertana? Gellekî eşkere ye ku Kitêba Pîroz tu carî nehatiye guhertin. Ên ku Xrîstiyanan bi guhertina Kitêba Pîroz tawanbar dikin, hewcedar in ku bersiva van pirsên jêrîn bidinê:

Kitêba Pîroz kengî hate guhertin?

Kî wê guhert?

Kîjan beşên wê hatin guhertin û çima hatin guhertin?

Gelo orjînala beşên ku hatine guhertin çawa ye?

Ji ber ku Kitêba Pîroz nehatiye guhertin eşkere ye ku tu kes nikare bi awayekî vekirî bersivê bide van pirsan.



6

## Peyxamgirtin û Wergerandin

Kitêba Pîroz peyxama Xwedê ye. Me vê rastiyê bi mînakên ku me ji Quranê dabû ji dîtin. Gellek gotinên peyxamberê ên ku ji berê ve hatine nivîsandin, piştî gellek salan çawa yek bi yek hatibin cih, ev yek jî delîl e ku Kitêba Pîroz peyxama ji Xwedê ve hatiye girtin e. Çalakiya ku Kitêba Pîroz li ser kesan, malbatan, civakan dike, peyîtandina bandora wê ya Xwedanî ye. Bitûmiya Kitêba Pîroz bi sedan zimanî ve hatiye wergerandin. Gellek beşên wê, mînak Încîl (Peymana Nû) kêm û zêde bi 2000 zimanî ve hatiye wergerandin. Wergervanan di karên xwe de îhtimamek mezin nîşan dane. Çawa ku di hinek zimanan de gellek werger hene, ev yek bûye sedema çêbûna ramanê "Gellek Kitêbên Pîroz hene, ma ka em ê çawa bawer bibin ku kîjan rast e?" Bi rastî di gellek zimanî de û di her zimanî de gellek werger hebin jî tenê yek Kitêba Pîroz heye. Mîna vê yekê, bona Quranê jî ev wisa ye. Îroj êdî Quran jî bi gellek zimanî ve hatiye wergerandin. Bi cihêtî hatibe wergerandin jî tenê yek Quranek heye.

## Încîla Barnaba Çiye?

Pirsên hevalên min ên di derbarê vê pirtûka ku bi navê Încîla Barnaba tête zanîn, min hinekî şaş dikin. Sedema vê yekê jî, yên ku van pirsan ji min dipirsin ne vê kitêbê xwendine ne jî pariyekî wê dîtine. Di derbarê ku ev pirtûk



bi rastî jî ne Încîl e, gellek delîl hene. Di warê erdenîgarî, dîrokî û ilmî de gellek xeletî hatine dîtin û bo vê yekê divê guh lê neyê dayîn. Him bi gotinên Kitêba Pîroz ve him jî bi yên Quranê ve çewt dikeve. Dr. Abas Mahmûd Al Akkad yê ku mîna mamosteyê Îslamê tête qebûl kirin û profesorêk kevn yê Zaningeha al Azhar ya Kahîreyê ye, daye xuyanî kirin ku ev pirtûk li dijî Quranê ye û çewt e.

Ji van çewtiyan yeka din jî; pirtûk dahkê dike ku Îsa gotiye, Ew bi xwe ne Mesîh e, lê li dijî vêya Muhammedê ku dê li pêy wî were, bi xwe Mesîh e.

Di Al Mawsooah Al Arabiah Al Moiassarah ya Ansîklopedia ya Ereban e, Dr. Mohammed Shafik Ghobal, dibêje ku Încîla Barnaba kitêbek wisa ye ku di sedsala 15.an de ji aliyê kesekî Ewropayî ve hatiye nivîsandin û di derbarê mijarên olî û polîtîk ên çaxa Mesîh Îsa de bi xetayan ve tijî ye. Û balê kişandiye gellek xetayên wekî dîn û wekî li jor hate nivîsandin, ber ve çewtiyên ku Îsa ne Mesîh e, lê Muhammedê ku dê li pêy wî bi xwe Mesîh e çi qas xelet e. Ji ber ku gellek mirov ne vê pirtûkê dîtine ne jî xwendine lê disa jî dahkê didin ku ew "Încîla Rasteqîn e", min gellek lêkolînê li ser vê mijarê kir. Her kesê ku bi balkêşî vê pirtûkê bixwînin, dê bi xwe jî fêm bikin ku ew bi xwe sexte ye. Yanê bi kurtasî Quran dinivîse ku Kitêba Pîroz ji aliyê Xwedê ve hatiye dayîn.

Me bi mînakan da nîşandayîn ku Kitêba Pîroz ya ku îroj di destê me deyî û Kitêba Pîroz a ku dema Quran bi Erebî derkęt holê wekhev in. Bi vî awayî em bi biryarî dibînin ku Kitêba Pîroz nehatiye guhertin

*"Ya XUDAN gotina te heta hetayiyan li ezmanan disekine."*
Mezmûr 119:89



# 2. DAREXAÇÎ KIRIN

## Destpêk

Bona mirovek rastiyê fêm bike, divê di dilê xwe de bona rastiyê daxwaz hebe û her çi bibe, bila bibe wê qebûl bike. Çawa ku yekî oldar nikare bi hêsanî dîtinên xwe yên olî biguhere û her mirov nikare wisa bike. Kirina vêya gellek êşê bide jî, axir û oxir gellek hêja ye. Mîna ku Mesîh gotiye: *"Hûn ê rastiyê bizanibin û dê rasti we azad bike"* (Yûhena 8:32). Dema mirov bona daxuyaniya rastiyê bike, dua ji Xwedê re dike, divê dema pêdivî hebe bona dev ji her tiştî berdanê amade bûn dixwaze. Divê em ji bîr nekin ku Xwedê bona dayînê ji yên ku li rastiyê digerin û ji Wî dixwazin re her tim amade ye.

Çawa ku me dît Kitêba Pîroz nehatiye guhertin, gelo di derbarê mirina Mesîh Îsa de çi gotiye em lê binêrin.

### Gelo Mirina Mesîh Îsa Rast e?

Gellek delîlên rastandina mirina Mesîh Îsa hene:

**Peymana Kevin**
Peymana Kevin ya mîna Kitêba Pîroz ya Cihûyan tête zanîn, di derbarê mirina Mesîh de qal dike. Di naveroka wê de, di derbarê mirina Mesîh de gellek gotinên peyxamberan hene.



8

Cihûyan gotinên peyxamberan nadin derewandin; heta alimê olê qebûl dikin ku ev peyxamberiyan di derheqê Mesîh de ne, lê belê bawer nakin ku Mesîhê rasteqîn hatiye. Heta dibêjin ku Îsa Mesîh sextekarek e. Heta rastiya ku, dema dê Mesîh were dê Wî qebûl nekin û dê Wî red bikin jî ji aliyê peyxamberên wan ve ji berê de hatibû daxuyanî kirin. De ka werin em di Peymana Kevin de, ji nêzîk de lêkolînê li hinek gotinên peyxamberan ên ku di mirina Mesîh Îsa nîşan didin bikin. Ya pêşiyê di pirtûka Îşaya Peyxamber, di beşa 53'yan vê pirtûka ku 700 sal berî hatina Mesîh hatiye nivîsandin de ye. Di vê beşê de nivîsandiye ku çawa Xwedê bi navdîtiya Wî hêza xwe nîşan dide lê dîsa jî gelê Cihû pê bawer nabe. Di navenda cihanek ziwa û xalî de yê ku ecibandina Xwedê qezenc kiriye Ew e, lê dîsa jî Cihûyan bêriya Wî nekirin û tiştekî dilkêş di Wî de nedîtin. Tenê bi dişteki dilkêş nedîtinê neman, di ser de Wî biçûk dîtin û red kirin. Çawa ku Îşaya Peyxamber di derbarê Mesîh de ev qasî bi eşkeretî nivîsandiye, dîsa jî Cihû qebûl nakin ku Ew li dêvila kesên wekî din êş û janê kişandiye: *Bi rastî Wî nexweşiyên me girte ser xwe, êşên me Wî li xwe bar kir. Lê me jî got qey ji aliyê Xwedê ve hatiye biceza kirin, hate lêxistin û pelixandin. Laşê Wî hate hilxepirîn, ji ber sûcên me Wî tehde dît. Cezaya ku bona xweşiya me hewce dike, ji Wî re hate dayîn. Me bi birînên Wî şifa dîtin. Em hemî mîna mîhan ji rê ve çewt bûbûn, her yekê jî me vegeriya rêya xwe. Û dîsa XUDAN ceza me hemiyan li Wî bar kir* (Îşaya 53:4-6). Li vir pêdivî nîne ku şiroveyek bête kirin. Ji ber ku ev ayetna bona mirovahiyê peyxama xelasî ya Xwedê ya herî kurt û rasteqîn e.



Di domahîka Îşaya beşa 53'yan de em fêr dibin ku Mesîh bi darazkirin û tawanbariyan ve bêdeng dimîne û ji dil diçe xaçê. Di derbarê vê mijarê de, di beşên Încîlê de heman tişt nivîsandine. Ev bûyerên ku ji aliyê Îşaya Peyxamber ve 700 sal berê hatine nivîsandin, di jiyana Mesîh de bûn. Bi rastî Cihûyan difikirin ku; Wî mîna rêbirekî, yanê mîna ku li her sûcdarê darexaçê ve tête kirin, ya bi sûcdarên wekî din re di kortikekê de binax bikin an jî bona ku ji heywanên hov re bibe xwarin tune bikin. Lê belê Xwedê pêşniyar dabû ku Ew di gora yekî dewlemend de bête binax kirin. Ev bûyer mîna ku di beşên Încîlê de hatiye nivîsandin çêbû. Ev mirovê dewlemend û bi rûmet ê ku qala wî têtê kirin Ûsivê Arîmetyayî ye. Ev bûyer di beşên Meta 27:57-60, Marqos 15: 43-46, Lûqa 23: 50-53 û Yûhena 19:38- 40 de jî hatiye nivîsandin. Jiyana Îsa Mesîh ya dinê, bi van gotinan tête pênasîn: *"Ji ber ku Wî tu carî neheqiyê nekir û ji devê Wî gotinek bi delk derneket."* Ev vegotin bêgunehî û bêqisûrbûna Wî derb dide. Vejîna Wî jî pêşiyê wisa hatibû têgihandin: *"Dê yê ji ezbeta xwe ve werin bibîne* (bi awayekî ruhanî, yanê ji yê ku baweriyê bi Wî anîne qal dike) *û dê rojên Wî dirêj bibe... Ji ber ku canê xwe fida kiriye, dê bi tiştên ku bibîne dilxweş bibe."* Di vê beşê de vegotinek din ya girîng jî, bona kesên wekî din canê xwe dayîn e. Mînak: *"Qûlê rast yê Xudan, dê gellekên ku wî qebûl bikin pak bike. Ji ber ku Wî sûcên wan girt ser xwe."* Paşê jî em vana dixwînin: *"Bona kesên din canê xwe fida kir. Bi sûcdaran re yek hate hesibandin."* Bi du rêbirî re bi darexaçê ve şidîna Wî ve, ev çêbû. Gunehên gellek kesan kişand. Di darexaçê



9

de ji bona kesên din dua kir. Bûyerên di vê beşa de têne gotin delîlên peyitandine ku Mesîh li dêvila me di xaçê de miriye.

Gelo Cihûyên ku bawer nabin van ayetna çawa dibînin? Heta salên P.Z. hezaran, şirovekarên Cihû, qebûl dikin ku ev ayet di derbarê Mesîh de ne, lê qenîet dianîn ku hê Ew nehatiye. Çi fêde, şirovekarên Cihû dema dîtin ku gelên van ayetana dixwînin dest bi pirsiyariyê dikin û bersivên şirovekaran nîne ku bersivdayîna pirsan bikin, şiroveyên xwe guhertin. Ev beşa ne di katên wan ên peristin û xwendinên olî de, ne jî di şiroveyên wan de heye. Di pirtûkek şiroveya Tewratê ya ku hevalek min yê Cihû dabû min de, çawa ku di derbarê nivîsên Îşaya de gellek tişt hebûn, lê di derbarê beşa 53.'yan de tenê şiroveyek jî tunebû. Ji ber ev beşa peyitandina bi biryarî ya redkirina Mesîhê ku ji wan re hatiye waad kirin xwestina wanî kuştina Wî ye.

## Peyxambertiyên wekî din ên di Peymana Kevin de

Di Peymana Kevin de, di derbarê mirina Mesîh de hê gellek peyxambertiyên din hene. Di Mezmûra 22 ya ku Dawid Peyxamberê ku hezar sal berî Mesîh jiyaye nivîsandiye; di derbarê rastiya qulkirina dest û pêlên Mesîh de dinivîse. Qenc tête zanîn ku ev bûyer nehat serê Dawid, lê gava Mesîh di darxaçê de şidandin, dest û pêlên Wî hatin qulkirin. Mîna vê yekê dema li darexaçê yî tî dibe dayîna



wanî sirkeyê di (Mezmûr 69:22) û (Yûhena 19:28-30) de nivîsandiye. Çawa ku leşkerên Romê kincên Wî di nava hev de parve kirin û bona kincên Wî pişkê kişandin ji aliyê nivîskarên Încîlê ve hate binqeyd kirin. Dawid Peyxamber vê bûyerê jî di Mezmûra 22'an de hezar sal berî Mesîh nivîsandibû.

Berî ku Mesîh Îsa were bi 400 salî, Zekerya Peyxamber dinivîse ku dê bedena wî bi rimê ve were qul kirin (Zekerya 12:10) Ev bûyer ji aliyê leşkerek Romî, dema Îsa li ser darexaçê bû, bona fêmkirina ka miriye an hê dijî, hate kirin (Yûhena 19: 33-34). Peymana Kevin mirina Mesîh Îsa ya li ser darexaçê û gellek bûyerên di derbarê wê de ne bi awayekî berfirehî dinivîse. Yên ku berê hatine gotin bitûmî hatin cîh; ji ber ku nivîskarê Kitêba Pîroz, Xwedayê ku serî û dawiya her tiştî ji berê ve dizane ye.

Di Peymana Kevin de jiyana gellek kesî û hinek tiştên ku bûne nîşan dayîn û teswîra mirina Mesîh in. Dema mirov ji nêzîk ve lêkolînê li vana bike, rasteqîniya mirina Mesîh a ku xelasiyê ji me re pêk aniye ji balê ve nareve. Mînaka herî qenc, di Kitêba Pîroz de hatiye nivîsandin; di beşa Afirandinê, birra 22'yan de, çîroka Brahîm û qurban kirina lawê wî ye.



10

Brahîmê ku bi gotina Xwedê re îtaetê dike, dixwaze ku lawê xwe qurban bike. Dema diçin cihê qurban kirinê, ji pirsa lawê xwe, *"Bavo, a vay agir û êzing lê ka qurban li ku ye?"*, yê ku nizane ew bi xwe qurbane re: *"Xwedê qurbanê dide lawê min"* bersivê dide. Dema digihêjin cihê qurban pêşkêşîkirinê de lawê xwe girê dide û bi pêşkêşîgehê ve dirêj dike û dema dê wî qurban bike, milyaketê Xwedê ji jor ve bangî wî dike û; *"Brahîm, Brahîm, destê xwe di lawik de nede"* dibêje. Brahîm dilsozî û ewlehiya xwe ya bi biryar nîşanî Xwedê da. Dema Brahîm li dora xwe nihêrt, beranek bi deviyan ve girêdayî dît. Wî rahişt û li dêvila lawê xwe qurban kir.

Ev çîroka rasteqîn pêdiviya Xelaskerekî ji me re nîşan dide. Beranê qurbanê bona xelaskerê rasteqîn tenê mînak û nîşanek bû. Bona Brahîm, lê dêvila lawê xwe qurbankirina beranekî, ne karekî dijwar ne jî biha bû. Çawa be Brahîm mirovek dewlemend bû. Hewce nema ku berdêla beranê qurbanê bide, ji ber ku Xwedê vî qurbanî dabû wî. Beran, nîşaneke bo xelaskerê rasteqîn bû. Kitêba Pîroz bi eşkeretî: *"Xwîna tu heywanî me ji gunehên me pak nake"* (Îbraniyan 10:4) dibêje. Cihûyan, bi sedsalan, bi milyonan heywanî mîna qurbanê pêşkêş kirin. Lê belê Yehyayê Waftîzkar bi nîşan dayîna Mesîh: *"A vay, Berxê Xwedê yê ku dê gunehê dinê ji holê rake!"* got (Yûhena 1:29). Hemiyên din ên qurbanê bona Xelaskerê Rasteqîn Mesîh Îsa nîşanek bûn.

Mînakek din jî qurbana fisihê yî. Dema Xwedê biryar da



ku dê gelê xwe Îsraêlê ji Misirê derxîne, hinek destûrên girîng dabûn Mûsa. Xwedê ji Mûsa re gotibû ku; bila her malbat berxekî bêqisûr serjê bikin û xwîna wê di şemûgên deriyan de û beştê jor ve bidin. Dema Xwedê Misiriyan bi yên ku pêşiyê zayîne biceza dikir, dest yên ku xwîna berxê di deriyê xwe de dane neda. Xwedê ji Mûsa re; dê milyaketê mirinê dest bi yên ku xwînê di deriyê xwe de dane nedişe û pêşîzayiyên wan nekuje, gotibû. Ev bi rastî jî wisa bû û da nîşandayîn ku mirina Îsa Mesîh jî bingeha xelasiya me ye. Di Peymana Kevin de mîna vêya gellek mînak hene. Bi kurtayî mirov dikare wisa bibêje: Peymana Kevin, mirina Mesîh, di Îşaya beşa 53.an de bi delîlên gellekî eşkere û bi vegotinên mînakî yên din agahî dida.

**Încîl (Peymana Nû)**

Încîl hînî me dide ku Mesîh di darexaçê de miriye û roja sêyemîn vejiyaye. Mesîh hê ji berê ve ji şagirtên xwe re gotibû ku dê ev yek wisa bibe. Ayêtên ji Meta ên ku em ê li vir bigehînin, di derbarê vê mijarê de zanînê didin me. Wekî din beşên din yên Încîlê jî rastiyên di derbarê vê mijarê de ne tesdîq dikin.

*"Li pêy vêya Îsa ji şagirtên xwe re got ku; divê ew ji biçe Orşelîmê, ji destên pêşhatiyan, serokkahînan û alimên olê ve gellekî jan û êşan bikişîne, bête kuştin û roja sêyem biveje" (Meta 16:21).*

*"Gava ew li Celîlê bûn, Îsa ji wan re got: Lawê Mirov dê bidin destê mirovan. Ew ê wî bikujin û roja sêwemîn, ew ê biveje. Û ji ber vê yekê şagirt zehf xemgîn bûn" (Meta 17:22-23).*

*"Dema diçûn Orşelîmê, Îsa di rê de donzdeh şagirtên xwe kişand aliyekî û ji wan re bi taybet vêya got: 'Niha em diçin Orşelîmê. Dê Lawê mirov radestî serokkahînan û alimên olê ve bikin, dê ew ji cezaya mirinê bidine Wî. Bona ku pê re qerfên xwe bikin, bi qamçiyan lêxinê û bi darexaçê ve bişidînin, dê Wî bidin destên neteweyên din. Çi heye ku Ew ê roja sêyemîn biveje" (Meta 20: 17-19).*

Wekî din jî, di heman beşê, ayeta 28.'an de Mesîh dibêje ew bona vê sedemê hatiye vê dinê, ne ku jê re xizmetê bikin, lê bona ku ew xizmetê bike û canê xwe bona gellekan wekî fidyeyekê bide. Hê di gellek ayetên Încîlê de Mesîh ji şagirtên xwe re mirina xwe û roja sêyemîn vejîna xwe gotibû û heta ka dê li ku û çawa bimire jî gotibû: *"Paşî ku Îsa hemiyên vana got, ji şagirtên xwe re; hûn dizanin, du rojên din cejna fisihê ye. Dê Lawê mirov bona ku bi darexaçê ve bête şidandin, bidne dest" (Meta 21:1-12).*



Çi balkêş e ku ji Daniêl Peyxamberê kêm û zêde 600 sal berî Mesîh jiyaye re, dema mirina Mesîh hatibû peyxamdayîn (Daniêl 9:26).

Her çar nivîskarên Încîlê jî şahdeyiyê anîbûn û bi dorûber nivîsandibûn ku; Mesîh derxistine pêşiya rayedarên Romî û alimên olê yên Cihû, Wî bi mirina darexaçê ve mehkûm kirine û kuştine.

Her kesê ku beşên Meta 26-27, Marqos 14-15, Lûqa 22-23 û Yûhena 18-19 bixwînin, dê bi biryarî fêm bikin ku yê ku hatiye, bi darexaçê ve hatiye şidandin û vejiyaye Mesîh e.

Meryema dayika Îsa di dema şidîna darexaçê de li wê bû û dizanîbû ku yê tête kuştin lawê wê Îsa ye. Nivîskarê Încîlê Yûhena yê nêzikayiya wî bi Îsa re tête zanîn jî li wê bû, her tiştî bi çavên xwe dît, bû şahidê hemî bûyeran...

Tiştên ku Mesîh di darexaçê de gotine, ji bilî Wî tu kes nikarîbû bigotana. Gotina Wî ya pêşin, *"Bavo, li wan biborîne, ji ber ku bi çi kirina xwe nizanin"* (Lûqa 23:34). Cihûda nikarîbû vêya bigota. Ji her du rêbirên ku bi Îsa re li ser darexaçê ve hatine şidîn, ji yê ku tobe kir û baweriyê aniye re, ji bilî Mesîh tu kesî nikarîbû bigota: *"Ez ji te re ya rastî bibêjim; tuyê jî îroj bi min re di buhuştê de bî"* (Lûqa 23:43). Hew Mesîh dikarîbû vê yekê bigota. Û ya dawîn tiştê ku li ser darexaçê gotiye: *"Bavo ruhê xwe dixim nav destên te!"* (Lûqa 23:46).



12

Her kesê cidî û li rastiyê digere, piştî ku bûyerên li her çar beşên Încîlê ve nivîsandine bixwîne, dê êdî di derbarê mirina Mesîh li ser xaçê de bêguman be. Diyar e ku şagirtên Wî nikarin vê çîroka mirinê li hev rast bikin. Şagirtan ji ber mirina Wî gellekî bi keser û xemgîn bûn, da ku vejîna Wî bihîstin û dîtin. Paşî ku Mesîh vejiya di dema çel rojî de gellek caran xwe nîşanî şagirtan kir û bi vî awayî gellek caran delîlên rast û biryarî nîşan da. Di derbarê mirina Wî de gûmana tu kesî tunebû lê belê Îsa Mesîh dixwest ji wan re bipeyitîne ku bi rastî jî Ew ji mirinê vejiyaye. Ev rastiyan di her çar beşên Încîlê de nivîsandine. Di Lûqa ya Încîlê, di beşên 24:44 – 48 de, Îsa dibêje ku vejîna Wî bi cihhatinên gotinên peyxamberî yên Peymana Kevin ve têkildar e. Ev bûyera dê bingeha Mizgîniyê ya ku ji hemî netewan re bête bihîstin biafiranda. Di êvara roja ku Îsa vejiyaye de xwe nîşanî şagirtên xwe kir: *"Bila xweşî li ser we be!"* got û şopên bizmarên di destên Wî de ne û kêleka xwe ya ku ji aliyê leşkerê Romî ve bi rimê hatiye qul kirin nîşanî wan da (Yûhena 18: 19-20). Bi vê yekê jî dipeyitand ku li dêvila Wî ne kesekî din, ew bi xwe li darexaçê ve hatiye şidandin.

**Bi kurtî delîlên di derbarên mirina Îsa Mesîh li ser darexaçê de**

- Gellek nivîsên peyxamberiyên Peymana Kevin ên di derbarê mirina Mesîh de hene.
- Mesîh gellek carî ji şagirtên xwe re digot Ew dê bimire û biveje.
- Her çar beşên Încîlê bikitekît mirina Wî gotine.



- Paşî ku Mesîh vejiya, ji şagirtên xwe re pêdiviya li ser darexaçê ve mirinê gotibû.

Böylece bu önemli ve gerçek olay hakkında tereddüt ve şüpheler olmamalıdır.

## Bersiva xeletiya ku lê tê gerîn

Gellek kes bi gotina; *"Gelo çima Xwedê Mesîh xelas nekir"* li xeletiyekê, qisûrekê digerin. Gelo Mesîh ji aliyê van mirovên xerab ve hate mexlûb kirin? Pirsek wisa mirov dikare bipirse? Ger Mesîh ji aliyê kesên din ve bi zordestiyê hustî lê hatîbaya xwar kirin û bi binve ketibûya, dê mafê pirsiyara vê pirsê bibûya. Lê mîna berê ji hatiye gotin; Îsa Mesîh ji xwe ji berê ve ji şagirtên xwe re gotibû ku ew bona gellekan canê xwe mîna fidyê bide, bi dilê hatiye. Helbet ku dema bixwesta dikarîbû xwe xelas bikira. Dema şagirtê Wî yê ku Wî daye dest, Cihûda Îsxeryotî ligel leşkeran bona ku Îsa radest bigirin hat, ji şagirtên ku xwestin Wî biparêzin re got ku; ger bixwaze, dikare ji Bavo Xwedê ve liq bi liq milyaketan bixwaze ku yên dixwazin Wî radest bigirin tune bikin. Lê belê xwe biparasta dê peyxamberiyên di derbarê Wî de ne çawa bihatana cih? Îsa ji şagirtên xwe re: *"Lê wê çaxê Nivîsên Pîroz ên divê wisa bibe, çawa bêne cih?"* (Meta 26:54) got. Birastî ji ger Mesîh bixwesta dikarî wan bi gotinekê bêbandor bihiştana. Di beşa Yûhena ya Încîlê de em wisa dixwînin: "Bi vî awayî Cihûda ligel liqek leşker ve peywirdarên serokkahîn û fêrisiyan şandine girt cem xwe û hate wê derê. Di destên wan de qendîl û petale û çek hebûn. Îsa bi heçiyên ku dê li serê Wî bigere dizanîbû. Derket pêşiyê û ji wan pirsî: *'Hûn li kê digerin?' Wan jî bi gotina 'Îsayê Nisretî' bersivê danê. Îsa ji wan re got: 'Ez im!' Cihûdayê ku xayintiyê pê kiriye jî bi wan re sekinî bû. Çaxa Îsa got: 'Ez im!' vekişîn û ketin xwarê'"* (Yûhena 18: 3-6).



Bê guman li cihekî wisa Îsa bixwesta dikarîbû xwe xelas bikira.

Xwe ji mirina li ser darexaçê xelasnekirina Wî, yên ku didîtin jî şaş û metal dikir. Digotin; *"Ger Xwedê ji Wî xweşbûya dê wî ji mirinê ve xelas bikira."* Dîsa di Peymana Kevin de, Dawid Peyxamberê ku 1000 sal berî Mesîh jiyaye, di derbarê Wî de peyxambertiyek wisa dikir: *"Her kesê ku min dibîne qerfê xwe bi min dike, lenciniyê dikin, serê xwe kil dikin û dibêjin ku; 'pişta xwe spartiye XUDAN, de bila Wî xelas bike, madem ku ji Wî hez dike, bila alîkariyê jê re bike!"* (Mezmûr 22:7-9).

Lê dîsa ji Mesîh nexwest ku xwe ji mirina li ser darexaçê xelas bike; ji ber, bona ku ji dil biçe mirina li ser darexaçê, sedemên Wî yên gellekî derbasdar hebûn.

XUDAN Mesîh ji ezmanan ve têdigehîne:
*"Ê ku zindî Ez im. Ez miribûm lê a vay, ez di tûmahiya bêdawîbûnan de zindî me..."* (Peyxamgirtin 1:18)

### Gelo Mirina Mesîh Girîng e?

Mirina Mesîh tenê mîna bûyerek ku bi gellek delîlan ve hatiye peyitandin namîne, di ser de rasteqîniyek girîng e. Dendikê Încîlê pêk tîne. Wateya Încîl: Nûçeya Qenc (Mizgînî) ye. Dema Şandî Pawlos bang bona bawermendên

li Korîntêne dikir: *"Ya birano, dixwazim ku Mizgîniya min agahî we kir û we jî qebûl kir û pê ve dilsoz mane di bîra we de binim; ger hûn bi gotina ku min ji we re mizgîn daye ve zexm bigirin, hûn ê bi navgîniya wê xelas bibin; dijberî wê divê we bi valahiyê bawerî anî be. Ji ber ku berî her tiştî yê ku min girt, têgihandim we: Ûsa ku, li gor Nivîsên Pîroz Mesîh, ji bona gunehên me mir û hate binerd kirin û li gor Nivîsên Pîroz, roja sisiyan vejiya"* (1.Korintiyan 15: 1-4).
Wateya gotina, "Li gora Nivîsên Pîroz" wisa ye ku, her tişt mîna ku di Peymana Kevin de nivîsandiye çêbûye.

Bona ku em giringî û hewcedariya mirina Mesîh fêm bikin; rastiyên li jêrê ne bizanibin.

- Me hemiyan guneh kirin
- Xwedê pîroz e û çav li gunehan nagire (ji neditinê nayê)
- Xwedê ji mirov hez dike û mirov di çavên Wî de gellekî bi rûmet e.
- Xwedê dema mirov xelas dike di heman demê de him bi dad û him jî dilovan be.

## Me hemiyan guneh kirin

Kitêba Pîroz ya peyxama Xwedê ye dibêje: *"Ji ber ku her kes guneh kir û ji bilindahiya Xwedê ve bêpar ma"* (Romiyan 3:23). Di Kitêba Pîroz de gellek ayetên piştgirê vê rasteqîniyê ne hene. Wijdanê me jî gunehkariya me li



wecê me diqire. Qiral Silêmanê ku lawê peyxamber Dawid e û bi gelleki zanyariya xwe ve tête zanin dibêje ku: *"Ji ber ku li rûyê erdê tu mirovê rast ê ku tim qenciyê dike û tu gunehan nekiriye, nîne"* (Waiz 7:20). Belê, li çi guneh têne hesibîn? Gellek kes dibêjin qey tiştên mîna dizî, mêrkujî, zîna, ji olê re kufur xerab in tenê guneh in. Lê belê guneh mîna li gora qaideyekê nekirin an jî li diji destûran rabûn jî dibe. Yanê destûrekê neanîna cih û bi vî awayî armancê lênegirtin dibe. Bi kurtayî her tiştên ku em dikin li pîrozî û rewnaqiya Xwedê ve neyê guneh e. Dema zîna tête kirin guneh li diji destûra Xwedê tişteki kirinê ve dibe. Mîna vêya dema fikra ramanên xerab û di nêrîna wêneyên xerab de jî mîna tişteki li diji pîroziya Xwedê dikin, em gunehan dikin. Ji ber vê yekê Mesîh Îsa dibêje ku: *"Her zilamê ku bi dilbijînê li jinikekê binihêre, wî di dilê xwe de êdî tevî wê zinê kiriye"* (Meta 5:28).

Divê em bifikirin ku Xwedê li her derê ye, her tiştê ku em dikin dibîne û her gotinên me dibihîze. Di hizûra Wî de derew gotin, Wî ji neditinê hatin ji Wî re bêhurmetî ye. Mîna wê pêkenokên xerab gotin û guhdayîna tiştên ku têne gotin û bi wan re kenin jî guneh e. Sedema vana bi kitekit gotina min, bi tûmî, em di derbarê gunehê de xwedî fikrek lawaz in. Em tu carî cidîyeta gunehkirinê û wisa kirin ji Xwedê re heqaret e tênagihînin. Dema Qiral Dawid guneh kir, Xwedê, bona ku ew qiral û peyxamber e, iltimasê li wî nekir. Peyxamberekî din şande cem Dawid û da fêmkirin; bi gunehê ku kiriye Xwedê biçûk dîtiye. A

vay, guneh tişteki ev qasî cidî ye. Di nava gunehê ku me kiriye de gunehên xemsariyê jî hene. Bona yekî ku di nava motajiya de yî, çawa ku ji destê me were lê ji ber xemsariyê alikarî nekirin guneh e. Kitêba Pîroz wisa dibêje: *"Ji ber vê yekê yê ku bi kirina tiştê qenc bizane û wê neke, dibe ku guneh kiribe"* (Încîl, Aqûp 4:17). Mîna ku ji nivîsên me jî hatibe fêmkirin, em dibînin ku me hemiyan guneh kirine û guneh, pirsgirêkek gellekî cidî ye.

## Xwedê pîroz e û çav li gunehan nagire

Heta ku dixwazî em oldar bin, tu yên me jî fêm nake ku Xwedê çi qas pîroz e. Him Peymana Kevin him jî Peymana Nû, her timî di derbarê pîroziya Xwedê de dibêje. Çavên Xwedê qandî ku li bêdadiyê nenihêre saf e. Îşaya Peyxamber (Beşa 6.) di xewn û xeyalekê de bi demekê be jî dibe şahidê pîroziya Xwedê. Dibe şahid ku milyaketan li hember rewnaqî û pîroziya Xwedê wece xwe dunuxumînin û bê sekin bi gotinên: *"Xwedê pîroz, pîroz, pîroz e"* qesîdeyan dixwînin. Îşaya di vê xewn û xeyalê de li hember pîrozî û rewnaqiya Xwedê, dema rewşa xwe ya gunehkar û aciz dibîne, bi tirsê ve dikeve û digirî. Bona ku em daraziya bidad ya ku guneh li xwe heq dike fêm bikin, pêşiyê bibînin ku li dijî pîrozî û rewnaqiya Xwedê guneh çi tiştekî kirêt e. Ger şagirtek heqaretê li hevalê xwe bike, ew dê cezaya li xwe heq kiriye bistîne. Ger heqaretê li mamostayê xwe bike, dê zêdetir ceza bistîne. Ger heqaretê li gerînendeyê



xwe bike cezaya wî hê jî girantir bibe. Ger li serokwezîr an jî yekî hê jî meqambilind re heqaretê bike, dê cezaya wî her ku biçe zêdetir bibe. Niha em bîstekê bisekinin û bifikirin ku ka me bi vê gunehkariyê çi li xwe heq kiriye. Ger ceza li gora miqamê kesên ku heqaret lê hatiye kirin zêde bibe, gelo dê cezaya sûc û gunehên li dijî Xwedayê ku pîrozî û bilindahiya Wî bêdawî ne, çi qasî zêde be... Bersiva vê pirsê eşkere û bi lerizîn e.

## Xwedê ji mirovan hez dike û mirov li ba Wî bi rûmet in.

Bi giştî, pirraniya mirovan bi vê rastiyê nizanin. Li gora baweriya ku giştî, çawa tête zanîn ku Xwedê dilovan û mêhrîvan e, lê bi rastî jî nayê zanîn ku Ew çi qasî ji mirovan ve hez dike. Kitêba Pîroz vê rastiyê bi eşkeretî dibêje. Belê, Xwedê gellek rûmetê dide canê mirov. Mesîh Îsa dibêje ku, divê mirov ji hemî malê dinê zêdetir rûmetê bide canê xwe. A vay heman gotinên Wî: *"Mirov hemiya dinê qezenc bike, lê ji canê xwe bibe, dê çi qenciya vêya jê re bibe? Ma mirov dikare çi di berdêla canê xwe de bide?"* (Meta 16:26).

Mîna ku di Kitêba Pîroz de jî nivîsandiye; sedema mirina Mesîh, hezkirina Xwedê ya ji mirovan re ye. Xwedê dema mirovan afirand, peyitand ku li cem Wî çi qas bi rûmet in.

**Ya yekemîn,** Xwedê got; "Em mirovan di haweya xwe de, di mînakiya xwe de biafirînin." Van gotinan bona afirên din ên ku afirandiye negot. **Ya duyem,** hilma jiyanê bi pozê mirovan ve pif kir. Bi vî awayî mirov bû heyînê dijî, ruhekî heta hetayiyê mayînde da wî. **Ya sêyemin,** dema Xwedê mirov diafirand, bi wî re axifî û wî pîroz kir û gellek ciyawaziyan da wî. **Ya çaremîn,** Xwedê berî ku mirov biafirîne her tiştên ku dê pêdivî pê hebe û zewqê jê bigire afirand û piştî ku mirov afirand bona wî bexçê buhuştê çikand (Bnr. Afirandin 1-2). Pîrozkirina mirov her dem daxwaza Xwedê bû. Heta di dema Nûh de, dema tofanê bi ser mirovahiya bi gunehên kûr ve ketine dişand jî wan dîsa bi berdar kir. Bang li Brahîm kir wî pîroz û bi berdar kir û got ku dê hemî neteweyan, bi navgîniya Mesîhê ku dê ji ezbeta wî bê ve, pîroz bike.

Ger em piçekî bifikirin, em dê heyranî hezkirin û rûmeta ku Xwedê dide mirovan bibin. Dawid Peyxamber, di Mezmûra 8.'an ya ku nivîsandiye de vê yekê tîne ziman. Dema li ezmanê, stêrkan û heyvê dinêre şaş û metal dimîne û çawa ku Xwedê ev qas bilind e lê dîsa jî mirov di bîr de tîne û pê têkildar dibe, wî ecêb dihêle. Xwedayê pîroz ji mirovê gunehkar ve hez dike lê belê ji gunehê dikerihe. Dema Xwedê hezkirin û dilovaniya xwe nîşan dide, pîroziya xwe ji diparêze.



## Dema Xwedê mirov xelas dike divê him bi dad him ji dilovan be

Dema hakimek dinyewî miroveki tawanek giran kiriye daraz bike, nikare him bi dad û him ji dilovan be. Dema li tawanbarê sûcê wî giran e biborîne wê gavê dê dilovan be lê ne bi dad be. Ger cezaya ku li xwe heq kiriye bide tawanbar wê gavê dê bi dad be lê ne dilovan be. Dibe ku mirov piçek bi dad, piçek jî dilovan be lê belê Xwedê nîşan dayiye ku Ew bi tûmî bi dad û xwedî dilovaniyek bêdawî ye. Ev bi çûyîna Mesîh ya bona me bi dil çû mirinê pêk hate. Dema Mesîh li ser darexaçê dimirî hemî gunehên mirovên ku Wî mîna xelaskirekî qebûl kirine hilgirt ser xwe.

Ji ber rastiyên ku li jorê hatine gotin bi giştî nayên zanîn, hêsan nabe ku gellek kes mirina Mesîh bona me bûye qebûl bikin. Bi rastî Kitêba Pîroz dibêje: *"Belavoka di derbara xaçê de, bona yên ku diçin mehfbûnê tewşî, bona me ên ku di xelasiyê de ne jî, hêza Xwedê ye"* (Încîl, 1.Korintiyan 1:18). Ev babeta, bi xwezayî hinek pirsên motajî bersivane jî di bîr de tîne. Ya yekemîn; ma çima yê ku divê bimire Mesîh bûya? Qenc tête zanîn ku tiştên gellek bi rûmet in, bi tiştên ku rûmeta wan kêm in ve nayên guhertin. Mînak gewherek bi sê-çar hezar eûroyî, bi 20 Eûro ve nayê guhertin. Mîna vê yekê, divê rûmeta kesê ku mirovan xelas bike ji di çavê Xwedê de bêdawî be û bikaribe hemiyên ku Wî bi baweriyê ve qebûl kirine xelas bike. Xwedê, bona Mesîh got ku ew lawê Wî yê xoşewîst, yê ku Wî xoşnûd dike ye. Kitêba Pîroz



17

dibêje ku, Xwedê dixwaze hemî tijibûna xwe di Wî de ji hebe. Ji ber vê yekê dikare hemiyên ku baweriyê pê anîne xelas bike. Tu şandî an jî peyxamber nikare vêya îdia bike. Yek ji şertê xelaskirina mirovê ku ketiye gunehê xelaskirin ew e ku xelasker divê bêguneh be. Divê yekî wisa di fikra xwe, axaftina xwe û kirinên xwe de qet gunehan nekiribe. Ev taybetmendiyan ji bilî Mesîh di keseki de tune bû. Hemî peyxamber û şandiyan mikur hatin ku guneh kirine. Mûsa di Mezmûr 90:8'de dema him gunehên xwe û him jî yê gel ji Xwedê re digehand, wisa digot: *"Te sûcên me derxistin ber xwe, gunehên me derxist ronahiya rûyê xwe."* Ger Mûsayê Peyxamberê Xudan ê mezin wisa gotibe, divê em çi bibêjin? Bi me ne giring xuya bibe jî, ji ber çewtiyek Mûsa, Xwedê destûr nedayê ku ew bikeve warê Kenanê. Xwedê bona ku avê ji gelê Îsraêl yê ku li çolê avê dixwaze pêk bîne, ji Mûsa re digot ku bila ji zinarê bixwaze, Mûsa bi çoyê ku di dest de yî li zinarê xist. Dê bo me tiştekî ne giring xuya bibe, lê di çavê Xwedê de kirina Mûsa bê îtaetî bû; ji ber tiştê ku jê re hatiye gotin, bitûmî neanî cih. Ji peyxamberên mezin Îşaya, dema bilindahiya Xwedê dît, fêm kir ku winda û tunebûyî ye (Îşaya 6: 1-5). Dema Dawid Peyxamber gunehên xwe di bîra xwe de anî, livînên wî bi hêstiran ve şil bû (Mezmûr 6:7). Lava ji Xwedê re kir ku wî paqij bike û dilekî nû bidê (Mezmûr 51:12). Şandî Yûhena: *"Ger em bibêjin gunehên me nîne, em ê xwe bixapînin"* (1.Yûhena 1:8) got. Pêtrûs ji Îsa re: *"Ya Xudan ji min dûr bisekine, ez mirovek biguneh im"* (Lûqa 5:8) got. Pawlûs dibêje ku ew ji gunehkarên pêşîn e (1. Tîmotêyos 1:15). Gelo em dikarin miroveki bê guneh ji ku ve bibînin?



Helbet yê bêguneh tenê Mesîh e. Kitêba Pîroz di derbara Wî de: *"Yê ku gunehê qet nas nekiriye"* (2.Korintiyan 5: 21). Pêtrûs: *"Yê ku qet guneh nekiriye"* (1.Pêtrûs 2:22) û Yûhena: *"Yê ku di Wî de qet guneh nîne"* (1.Yûhena 3:5) dibêje. Ji ber ku tenê û tenê di derbara Mesîh de ev tişt tête gotin, tenê Ew dikarê bibe xelaskerê mirovan.

**Ya Duyemin;** gelo em nikarin xwe bi karên xweyî qenc ve xelas bikin? Mixabin hema hema di her olê de gellek kes dibêjin qey dê bi kirinên xwe yên qenc ji cezaya gunehan xelas bibin. Difikirin ku dê di roja daraziyê de Xwedê kirinên wan yê qenc deyne şkevika mêzinê û kirinên wan ên xerab jî deyne şkevika din û wan biwezîne û qedera wan bi vî awayî diyar bibe. Gelo her kesek, dizanî giraniya her gunehî çiye? Ma giraniya derewê çiye? Ya hemî derewên di tûmiya jiyanê de hatine gotin? Bêexlaqî, nerast bûn, çavbirçîtî û gunehên din? Bi rastî jî ramanek mirov bi tirsê ve dixe. Divê em ne bi pîvana xwe ya texmînî, lê bi pîrozî û ronahiya Xwedê ve li gunehê binêrin.

Niha em li qenciyên ku me kirine binêrin û biwezînin. Gelo heqê qesrek em li dinê pêncî, şêst an jî sed sal tê de bijîn dê bi çi qasî be? Ya li buhuştê, cihekî em di nava bêdawîbûnan de lê bijîn em dê çawa qezenc bikin? Hevalo, qet kesek ji me, ne di wê xurtayiyê de yî ku li wir, cihekî wisa qezenc bikî. Ew der şûnwara Xwedê ye. Em bibêjin tu yekî guneh nekiribe jî, tenê dikare hêviya bi dojehê ve neavêtinê bikî, lê belê ne mafê çûyîna buhuştê yî. Ma tu nizanî, karên me



18

yên qenc bi giştî ji ber xirûr û pesnahiya mirov dikin ve tête rizandin? Mîna Îşaya peyxamber dibêje, hemî qenciyên me mîna paçekî qirêj in (Îşaya 64:6) Dide nîşandayin ku ji aliyekî karên oldarî dikin lê li aliyê din ji guneh tête kirin.

Rojekê di dergehê mezin ya apartumanek gellek malbat tê de hene de zilamekî nimêjê dike dîtim. Vî zilamî nimêjê dikir, di heman demê de zarokek gava kete hundir, piçekî şemate kir. Li ser vê yekê zilam dev ji nimêja xwe berda û bi gede qêriya û çêra kir. Piştî ku zarok reviya derve, viya dîsa ji cihê ku maye dest bi nimêja xwe kir. Niha vî zilamî her çi qas xwe şuştibe bila bişo, ma nimejek wisa dê qebûl bibe? Kirin û tevgerên me yên qenc hebin jî, ev gunehên me ji holê ranakin. Yekî ku keseki din bukuje qesas e, çi qas karên wî yên qenc hebin bila be. An jî yekî carekê ji gunehan kiribe, ew gunehkar e.

Ger Kitêba Pîroz; tu kes li hemberî zagonê nikare pak bibe (Romiyan 3:20) bibêje, divê em lê şaş nebînin. Bi rastî Zagona Xwedê tenê gunehkarbûna me nîşanî me dide. Bo vê yekê bi karên xwe yên qenc ve ewlebûna me dê xapînokî bibe. Îsa Mesîh di mînandinekê de dibêje ku du kes bona duakirinê diçin perestgehê, yek Fêrisiyek oldar, yê din jî peywirdarê gumrikê ku neheqiyan dike û bi navekî neqenc tête zanîn bû: *"Yê Fêrisî rabû û ji xwe bi xwe re bi vî awayî dua kir: Ya Xwedê, ez sipasiyê ji te re dikim ku, ez ne wek mirovên din im: Rêbir, neheq, zînakar, an jî wek vî bacgirê hanê. Ez di heftiyê de du carî rojiyê digirim û deheka hemû*



*qezenca xwe didim! Lê belê yê bacgir jî ji dûr ve rawestabû û ne dixwest ku çavên xwe jî ber bi ezmanan ve rake; wî li sînga xwe dixist û digot: Ya Xwedê, dilovaniyê li min gunehkarî bike!"* (Lûqa 18: 11-13) digot.

Bi gotineke din: Yek olperest bû, karên qenc dikir û bi vî awayî digot qey dê ecibandina Xwedê qezenc bike. Difikirî ku ew ji mirovên din hê jî qenctir e; di rewşa xwe ya normal de ji aliyê mirovahî û exlaqî de wisa bû jî. Yê din jî bi gunehkariya xwe mukir dihat û ji Xwedê ve lava bona mêhrîvaniyê dikir. Ka niha jî em li ramanên Îsa Mesîh yê di derbarê vana de ne binêrin. Îsa dibêje ku, yê bi gunehkariya xwe mukir hat û çavên xwe ber ve ezmanan rakirinê jî ji xwe re liyaq nabîne, bi awayekî pakbûyî vegeriya mala xwe. Lê li dijî vê yekê dibêje ku, duaya yê xwe ji kesên din birûmettir dibîne ji bêrûmet e.

**Ya sêyemin;** Gelo hûn ê ji yekîtiyek ji karên qenc û dilovaniya Xwedê ve avabûyî bibêjin çi? Yanê piçek ji karên qenc û piçekî ji ji dilovaniya Xwedê ve dê xelasî nebe? Dibe ku di nêrîna pêşin de bivac bê xuyabûn. Bi rastî fikr û ramanê gellek kesî ji ev e. Dibêjin em ya ku bi ser me dikeve bikin, bila Xwedê jî ya bi ser xwe ve dikeve bike. Lê belê Xwedê di derbarê vê mijarê de dibêje çi? Xelasî ne bi karên qenc lê bi xweşxwaziyê ve dibe. Belê, giringiya karên qenc heye mihaqeq, ji ber ku ew fêkiyên xelasiyê ne. Lê belê xelasî ne bi saya wan e. Di derbarê vê mijarê de em dikarin çend ayetî ji Kitêba Pîroz ve bi mînakî bidin.

*"Bi rêya baweriyê, bi xweşxwaziyê ve hûn xelas bûn. Ev ne qenciya we, lê diyariya Xwedê ye. Bona kes pesnahiya xwe nede, ne xelata karên qenc e"* (Efesiyan 2: 8-9).

*"Em bi saya dewlemendiya xweşxwaziya Wî ya ku bi fêhmkarî û zanyariyek bitûmî bi ser me ve barandiye, bi navdîtiya xwîna Mesîh, em di Mesîh de gihaştin xelasiyê û lêbexşandina sûcên xwe"* (Efesiyan 1: 7-8).

*"Mirovan bi xelasiya ku di Îsa Mesîh de ye, bi xweşxwaziya Xwedê, bêberdêl têne pak kirin"* (Romiyan 3:24)

Mîna ku em di van ayetan de jî dibînin, ne bi heqkirina xwe, lê bi xwêrxwaziya Xwedê em xelas dibin. Û em fêm dikin ku ev jî spartiyî karê xelasiya ku Mesîh li ser darexaçê ve pêşkêşî me kiriye yî. Dilovanî pêşkêşiya Xwedê ya bona mirovan, bawerî jî qebûlkirina mirovan ya pêşkêşiyê yî. Dîsa di Romiyan 11:6'an de: *"Ger bi xwêrxwaziyê bûbe, wê gavê dibe ku bi karên qenc nebûye. Yana xwêrxwazî êdî ji sayedarûbûnê ve derdikeve"* dibêje. Ev, ji gotina Xwedê ya ku peyxamkirî, hînkariya Wî ya eşkere yî. Gellek kes vê pirsê dipirsin: Ger xelasî bi rêya baweriyê, bi xwêrxwaziyê be, em baweriyê bînin û paşê her tiştê ku dixwazin bikin, gelo em ê dîsa jî xelas bibin? Berviva vêya; kesekî bawermend, tenê tiştên ku Xwedê dixwaze dike. Baweriya rasteqîn Îsa Mesîh girtina dilê xwe û jiyanek ruhanî ya nû bi dest ve xistin e. Kesê ku nû bûye, ji yê bi dad e hez dike û ji gunehan ve dikerihe. Baweriya ku di jiyana mirovan de guhertinekê



nake, ne baweriya rasteqîn e. Ev tenê, tesdîqa qebûl kirina baweriyekê dibe.

**Ya çaremin;** gelo biceza kirina ku Xwedê çawa ku Mesîh Îsa li dêvila me biceza kiriye, rast bû? Divê em pêşiyê têbigehînin ku Mesîh bi xwe ji dil û daxwaz xwe mîna qurbana me ya xelasiyê pêşkêş kiriye. Kesî zorê neda wî. Ji şagirtên xwe, ji gellekan re bi caran ve got ku ew bona jiyana xwe kêferat bike hatiye (Meta 20:28). Çawa ku got Ew şivanek qenc e û şivanê qenc canê xwe di ber mihên xwe de dide (Yûhena 10:11). Dema Îsa Mesîh di derbarê mirin û vejîna xwe de diaxifî wisa digot: *"Ez ê canê xwe, bona ku dîsa bistînim bidim, bo vê yekê bavo ji min hez dike. Tu kes nikare canê min ji min bistîne; ez wê bi xwe didim. Bona dayîn û dîsa şunda stendinê jî rayedariya min heye. Min vê destûrê ji Bavê xwe ve stend"* (Yûhena 10: 17 – 18). Em dibînin ku dema diçû mirinê, daxwazên xwe, bitûmî bi daxwazên Xwedê ve lihev kir. Divê hemiyên vana pêk bînin ku, wê hezkirina hişê mirov nagihêjê em fêm bikin, em jî jê hez bikin û şukiriyê bikin. Ger em vegotinên xwe bidine hev: Me dît ku mirina Mesîh rasteqîniyek dîrokî ya li ser nîqaş jî nabe û pêdiviya wê bona xelasiya me heye, ji bilî Wî bona me xelaskerek nîne û Ew bona me ji dil bi ser mirinê ve meşiya. Û me fêm kirin ku em nikarin xwe bi xwe xelas bikin, Xwedê jî di gotina xwe de bi eşkeretî dibêje ku ji bilî Mesîh di kesekî din de xelasî nîne. *"Û wekî din di tu kesî de xelasî nîne; ji ber ku di binya ezmên de di nav mirovan de wekî din navekî ku hatiye dayîn nîne ku, em*

*bikaribin bi wî xelas bibin!"* (Karên Şagirtan 4:12).

*"Lê belê Xwedê, ji me hezkirina xwe bi vêya ispat dike: Gava ku hîn em gunehkar bûn, Mesîh bona me mir"* (Romiyan 5:8).

## 3. YEKİTİYA SÊBARE

### Gelo Yekitiya Sêbare pirrxwedanî ye?

Berî ku em dest bi vê mijara girîng bikin, divê em bizanibin ku di hînkariya bingehîn ya Kitêba Pîroz de tenê hînkariya yek Xwedanî heye. Him Peymana Kevin him jî ya Nû van rastiyên bingehîn ên ku gelleki girîng in hînî me dikin. Em li vir çend ayetî bi mînakî bidin.

*"Bo vê yekê, îro bizanibin ku; XUDAN li jor li ezmanan, li jêr, li rûyê erdê Xwedê ye û ji bilî Wî nîne û vê yekê ji hişên xwe dernexînin"* (5.Mûsa 4:39).

*"Guhdarî bike ya Îsraêl! Xwedayê me XUDAN, XUDANê yekane ye. Divê hûn Xwedayê xwe XUDAN, bi hemiya dilê xwe, hemiya canê xwe, hemiya hêza xwe hez bikin"* (1.Mûsa 6:4-5).

*"XUDAN Xelasker û Qiralê Îsraêlê, XUDANê ku Serwerê Her Tiştî ye dibêje ku, "Pêşî û dawî ez im. Xeynî min Xwedê nîne"* (Îşaya 44:6).



*"XUDAN ez im, wekî din nîne. Xeynî min Xwedê nîne"* (Îşaya 45:5).

*"Xeynî min Xwedê nîne, Xwedayê bidad û Xelasker ez im. Ji bilî, min nîne. Ey kesên li çar aliyê dinê, vegerin min, hûn ê xelas bibin ji ber ku Xwedê ez im, wekî din nîne"* (Îşaya 45:21-22).

*"Ma bavê me hemiyan ne yek e? Yê ku me afirandiye ne heman Xwedê ye?"* (Maleyaxî 2:10)

*"Hatiye nivîsandin ku; 'Tuyê peristinê ji Xwedayê xwe Xudan re bikî û tenê qûlitiyê ji Wîre bikî'"* (Meta 4:10).

*"...Xwedê yek e û ji bilî Wî nîne"* (Marqos 12:32).

*"Hûn ji hevûdu pesnahiyan qebûl dikin, lê bona pesnahiya Xwedayê tekane qezenc bikin naxebitin. Ma di vê rewşê de ka hûn ê çawa baweriya xwe bînin?"* (Yûhena 5:44).

*"Navgînî ne yê aliyekê tenê ye; lê Xwedê yek e"* (Galatiyan 3:20).

*"Ji ber ku tenê Xwedayek û navgîniyek tenê yê ku di nava Xwedê û mirovande ne, heye. Ew jî mirovek, Mesîh Îsa yê ku xwe bona her kesî weke fidye pêşkêş kiriye yî"* (1.Timotêyos 2:5).

*"Tu bi yekbûna Xwedê bawer dikî, qenc dikî"* (Aqûp 2:19).

Mirov dikare hê gellek ayetên din ên ku ji Kitêba Pîroz in û di derbarê yekbûna Xwedê de ne bidî. Ji vê yekê ji tête fêm kirin, di hînkariya Xrîstiyanî ya ku li gora Kitêba Pîroz e, pirr xwedanî nîne.

## Wateya Yekîtiya Sêber

Wê gavê em ji yekitiya sêber ve çi fam dikin? Ev bêje di Kitêba Pîroz de nîne. Hinekan ji vêya re dibêjin "Teslis" lê belê ev bêje ji di Kitêba Pîroz de nîne. Têgeya Yekitiya Sêber, bi vac û terîfa mirov, rewişta Xwedê û hebûna Wî ya bilind têgihandineke bi dilgermî ye. Divê her mirovê bivac bizanibe ku hinek rastiyên di derbarê Xwedê de ne hişê mirovan pêşvetir û girantir e. Me bi vî awayî fêm kirin ku di hînkariya Kitêba Pîroz de Xwedayek tenê heye. Disa ji Xwedayê ku tenêyî, xwe di sê kesayetî de têgihandiye. Ev sê kesayetiyên mîna Bav, Law û Ruhê Pîroz in û heta abadîniyê mayînde ne. A vay, ji vêya bi "Yekîtiya Sêber" tête binav kirin.

Yekitiya Xwedanî ne mîna yekitiya mirovî ye. Mirov di yekitiya xwe de bidawî ye (bitixûb e). Ev bona hemî afirên ku hatine afirandin wisa ye. Di heman demê de nikarin li du cihî bin. Lê belê ma em dikarin di derheqê Afirkirê rastî û zindî de heman tiştî bibêjin? Helbet na! Ger Xwedê bixwaze



dikare him li textê xwe, li ezmanan rûnê û di heman demê de li erdê be jî; ji ber ku Ew Xwedê ye. Em nikarin vekolana vê rastiyê bi kanûnên fizîk an jî matematîkê bikin. Xwedê ji hemiyên van kanûn wêdetir e. Afirên xwe bi kanûnên fizîk û kîmya ve girê da, lê belê ew li derveyî van kanûnan, bi ser wan ve ye. Dema em di derbarê afiran an jî bûjenan bibêjim em dikarin bêjin 1+1+1 = 3'ye. Lê belê Xwedê ruh e. Bi kanûnên xwezayî, ên ku Wî bi xwe afirandiye ve ne girêdayî ye. Herge careki din gotin bixwaze; Xwedê dema li ezmanan an jî rûyê erdê yî heman û yek Xwedê yî, ne dudo. A vay, bi rastî ev bûyer, dema Îsa Mesîh di wekheviya mirov de hate bû. Tiştên ku di yekane çavkaniya rasteqîniyên di derbarê Xwedê de em hîn bibin, di Kitêba Pîroz de gotine, gotinên Wî bi xwe ne.

Xwedê di Nivîsên Pîroz de, di derbarê Mesîh de wisa dibêje: *"Bê gûman raza rêya Xwedê mezin e. Ew di bedenê de hate xuyabûn"* (1.Tîmotêyos 3:6). Di bedenê de xuyabûn, bi giştî di wateya "mirov bûyin" de tête bikar anîn. Ev bêje jî di Kitêba Pîroz de nîne, lê belê rasteqîniyên Kitêba Pîroz tîne zimên.

### Di bedena mirov de xuyabûn

Ev vegotin rastiya ku Xwedê di bedena mirov de hatiye dinê binav dike. Bona hinekan têgihek lê nayê bawerî kirin û biyan e. Lê belê hezkirina Xwedê ya ji me re yî (hezkirinek



22

hişê mirov nikare bigihêje) tîne zimên. Em mirovên ku xwediyê xwezayek gunehkar in, nikarin hezkirinek wisa xeyal jî bikin. Lê hew hezkirina Xwedê xwedanî ye. Bi vê yekê jî em fêm dikin ku mirov di çavê Xwedê de birûmet e. Ka em yên ku pêşiyê hatine gotin dubare bikin: Dema Xwedê, mirov afirand, bi wî re di nava têkiliyek gellekî nêzik de bû. Di bexçê buhuştê de seridanka wî dikir û pê re galegalê dikir. Ev hevrebûn bi navdîtiya gunehê winda bû; lê belê Xwedê xwest ku disa vê yekitiyê pêk bîne. Ya na dê mîna Şêytan bi serketiye xuya bibûya; divê wisa nebûya.

Bona karê xelasiyê di bedena mirov de xuyabûn pêwistiyek bû. Bona ku di bedenê de xuyabûnê em bigehînin, vê yekê piçekî bi wêyenên dîrokî ve bixemilînin. Gellekên me bihîstine ku hinek qiralan, bona bi kincên qiraletiyên bi rewnaq mirovan neferihînin, bi guhertina kincan diçin mala mirovên xizan û bi vî awayî digihêjin kul û keserên wan, hînî pirsgirêkên wan dibin. Min di pirtûkekê de xwendibû ku qiralek wisa kiriye. Bêgûman divê van kirinan û kiryarên tiştên wisa bête pesnandin. Miqamê kesekî her çi qas bilind be, vê kirina wî ya dilnizmî hê jî tête pesnandin. Lê gelo ji vana ya herî bi rûmet û yê herî mezin e kî ye? Ma ne Xwedayê me afirandiye yî? Gava bixwaze bi awayek bi bedenî were dinê, kî dikare bibe asteng? Bi vî awayî, fersenda me bû ku em bi rêyek wisa nuwaze Xwedê binasin.

Demekê min di derbarê zarokekî de çîrokekê xwendibû. Bi heyranî, gêrikên ku di rêya seyareyan de ji xwe re rê vekirine



û mîna teriyeke dirêj diçin û têne temaşe dikir. Dema ji dûr ve didît ku seyare têne, bi dengekî bilind bang li gêrîkan dikir ku bila vekişin. Kalepîrek dema vê yekê dibîne, ji yê zarok re dibirse ku ka çi dike. Zarok ji kirina xwe jê re gotiye. Li ser vê yekê zilam jê re gotiye ku ger bixwazî gêrik ji wî fêm bikin, divê bibe yek ji wan. Xwedê jî mîna me beden girt û hat, ji ber ku bi awayekî din bihata, me nikarîbûn Wî fêm bikirana. Bo vê yekê Mesîh: *"Yê ku min dîtiye, wekî Bavo dîtibe"* (Yûhena 14:9) got. Û disa di beşa Yûhena de, *"Tu kes, tu carî Xwedê nedît. Lawê ku di singa Bavo de ye û Xwedê ye Wî da nasîn"* (Yûhena 1:18) tête gotin.

Ev ayeta me ber ve pirsandina vê pirsa balkêş dike: Gelo dema em dibêjin Mesîh "Lawê Xwedê yî" em dixwazin çi bibêjin? Her yê ku hişê wî li şerî be helbet dê bizanibe ku em di derbarê gayîna heşa Xwedê û miroveki qal û behs nakin. Divê ramanek wisa ji aliyê her kesê ku bi Xwedayê afirkirê erd û ezmanan e, zindî û rasteqîn e dîperiste ve bête red kirin. Di demên kevin de, di gelên senemperest de ramanek wisa hebû. Xrîstiyanek dizane ku Xwedê ruh e û ji ramanek wisa dikerihe. Berî ku têgihe Lawitî ya Mesîh daxuyani bikim, dixwazim bibêjim ku ev ne nûvedana Xrîstiyanan e, lê bi xwe gotina Xwedê ye.

Dema Xwedê Cebrayîlê milyaket ji Meryema duşîze re şand, milyaket çû bala wê û: *"Silav ya keça gîhaştiye saye ya Xwedê! Xudan bi te re yî"* got. *Meryema ku bi tiştên têne gotin gellekî şaş mayî dest bi fikrandinê kir ku gelo ev wateya*



23

*vê silavê çiye? Lê belê milyaket ji wê re: "Meryemê metirse" got, "Tu gîhaşt saye ya Xwedê. Binêre tuyê avis bimîne, lawekî bizê û navê Îsa lê bike. Ew dê mezin bibe, dê jê re navê "Lawê Bilndê Bilindan" bête gotin"* (Lûqa 1:28 – 32). Dema Meryemê bi vê yekê şaş û metal ma û got hê destê zilamekî li dest neketiye ka ev dê çawa bibe, milyaket bi vî awayî bersivê dayê: *"Dê Ruhê Pîroz were ser te û Yê Herî Bilind siya xwe bi ser te ve berde; ji ber vê yekê, dê ji wî Pîrozê ku biwelide re, Lawê Xwedê bête gotin"* (Lûqa 1: 35).

Wekî ku dibînin, rasteqîniya avismayîn û zayîna Meryemê, lawê ku aniye dinê dê "Mesîh Îsa yê Lawê Xwedê" bûna Wî, bi xwe ji aliyê Xwedê ve, bi navgîniya milyaketê Wî Cebrayîl, ji berê ve ji Meryemê re tête gîhandin.

Xwedê vê rastiyê paşê jî bi dengê xwe, berî ku Mesîh dest bi peywira xwe bike ji mirovan re da bihîstin. Berî ku Mesîh dest bi peywira xwe bike çû cem Yehyayê vaftîzkar û vaftîz bû û bi vê yekê dest bi peywira xwe kirinê him li ber Xwedê, him jî li ber mirovan da xuya kirin. Paşî ku vaftîz bû û ji avê ve derket: *"Dengek ji ezmanan, 'Lawê minî Xoşewist ev e, ez ji Wî dilxweş im'"* got (Meta 3:17). Ev bûyer di beşên dîn ên Încîlê de jî hatiye nivîsandin.

Xwedê demek kurt berî bûyera darexaçê, dîsa hatina Mesîh Îsa ya ji xwe dubare dike: *"...Îsa tenê Pêtrûs, Aqûb û Yûhenayê birayê Aqûb girte cem xwe û hilkişiya çiyayekî bilind. Li ber çavên wan xuyabûna Îsa hate guhertin. Wecê*



*Wî mîna rojê biriqî, kincên Wî mîna ronahiyê sipî boz bûn. Di wê demê de Mûsa û Êlyas bi şagirtan ve xuyanî bûn. Bi Îsa re diaxifîn. Pêtrûs jî Îsa re: 'Ya Xudan' got, Li vê derê bûyîna me çi qenc bû! Ger tu bixwazî ez li vir sê çardexî ava bikim: Yek ji te re, yek jî Mûsa re, yek jî ji Êlyas re'. Hê Pêtrûs diaxifî, ewrek dibiriqe siyê da ser wan. Dengek ji ewrê hat û got: 'Lawê minî Xoşewist ev e, ez ji Wî dilxweş im, Wî guhdarî bikin'* (Meta 17: 1-5).

Ev bûyer di beşên Încîlê yên ku Marqos û Lûqa nivîsandine de jî hene. Ger Xwedê ji Mesîh re bibêje: "Lawê minî Xoşewist", ma kî yê ji me dikare bervêdanê bike? Ma tu kes kare qedexeyiyê ji Xwedê re bîne ku bila tiştekî wisa nebêje? Em dikarin ji Kitêba Pîroz hê gellek ayetan mînak bidin ku Mesîh Îsa Lawê Xwedê yê abadîn e. Lê belê di ayetên ku me li vir mînak dane de bi eşkereti em dibînin ku Xwedê ji Mesîh re dibêje "Lawê min".

Ka Lawê Xwedê di kîjan wateyê de yî? Wekî me ji berê ve daxuyanî kir ku (heşa), jinek Xwedê nîne. Ramanek wisa bi rastî ji çêr û heqaret e; fikarek zişt e. Wateya vêya; Mesîh ji Xwedê ve hatiye, ji derûna Wî bi xwe ye. Yê ku ji mirovekî bizê mirov e. Yê ku ji heywanekî bûye ji heywan e. Lawbûna Mesîh ji Xwedê re ne cismanî lê ruhanî ye. Ne bi mirevekî re bi yeklaşîbûnê ye. Ji vê wêdetirê, wekî bi zanîna fêmkariya me bitixûb e, divê li hember tiştên ku Xwedê di derheqê xwe de gotine bejna xwe bitewînin, peristinê ji Wî re bikin û bawer bibin. Fêmkariya mirov bi



24

hed e û tiştên ku bi hed e nikarin têbigehêjin tiştê bê hed (bêdawî) û wê kişf bikin. Beriya ku baweriyê bi Mesîh Îsa ve bînin fêmkariya mirov, ji aliyê ruh ve di reşetariyê de yî. Gava Îsa Mesîh wekî Xudan û Xelasker bête qebûl kirin ev şaşitî derbas dibe û ruhê mirov ronî dibe.

Ayêtên Kitêba Pîroz, ên ku em ê mînak bidine dê bona fêmkariya yekbûna Xwedê alîkar be ji me re. Îsa Mesîh dema di derbarê yên ku baweriyê pê anîne re diaxifî: *"Mihên min dengê min dibihîzin û ez ji wan nas dikim û ew li pey min tên û ez jiyana abadîn didim wan û ew abadîn helaq nabin û tu kes nikare wan ji destê min derxîne. Bavê min, yê ku ew dane min, ji hemûyan mezintir e û hêza tu kesî nikare wan ji destê Bav derxîne. Ez û Bav yek in"* (Yûhena 10: 27-30) got. Di axaftina xwe ya bi şagirtên xwe re du carî, di Yûhena beşa 14:8-11'an de got ku; *"Bavo di Wî de, Ew di Bavo da ye."* Ruhê Pîroz ji Xwedê ye û him bi Bav re, him jî bi Law re yek e. Dema yekî bi navê Hananya derewan got Pêtrûs jê re: *"Hananya, çawa bû ku te li gor şêytan kir û derewê ji Rujê Pîroz re kir?... Te derewê ne ji mirovan re, lê ji Xwedê re kir"* (Karên Şagirtan 5: 1-4) got. Berî ku Îsa Mesîh hilkişe ezmanan, ji şagirtên xwe re, bona ku mizgîniya xelasiyê bi hemiya neteweyan re belav bikin, destûrê da ku bila yên ji Wî hîn bûne hînî mirovan bikin û wan *"bi navê Bavo, Law û Ruhê Pîroz"* vaftîz bikin (Meta 28:18). Bi vebêja li vir, em balê bikişînin gotina ku ne bi "Navên" lê bi vegotina "Navê" têgihandinê. Ji ber ku ji yek navî, yanê ji "Yek Navê Xwedayê ku rast û zindî ye tête qal kirin. Ev razek e. Belê, di heman



demê de rasteqîniyek xwedanî ya di gotina peyxamkfrî ya Xwedê de têtê hînkirin e.

Naveroka van rastiyan, rasteqîniyên pirr giring û gellekî bi rûmet in. Em li vê, hezkirina Bavo, ya ku bona me ji helaqbûnê xelas bike Lawê xwe yê ku bi xwe re yek e dişîne dibînin. Xwedê Lawê xwe yê yekane, yekta û bêhempa bona me şand dinê. *"Ji ber ku Xwedê evqas pirr ji dinê hez kir ku, Lawê xwe yê tekane da; da ku, bila tu kes, ji yên bawerî bi wî bîne helaq nebe, lê bila jiyana wî ya abadîn hebe"* (Yûhena 3:16). Li vir, wekî din em hezkirina Mesîh yê ku li gunehên kesên Wî bi bawerî girtine dilên xwe bexşandiye û bona ku jiyana bêdawî bide wan, ji dil çûye mirinê, jî dibînin. Ruhê Pîroz yê Xwedê gunehên me nîşanî me dide, berê me dide tobê û bi Mesîh ve bawerbûna me pêk tîne. Em dibînin ku hemî karên Xwedê, bona bi bereketbûna me ye.

Hînkariya di derbarê yekîtiya sêber de yî, wekî din pirsgirêkek din jî çareser dike. Bersivê dide pirsa ku gellekan şaş dike ji. Gelo Xwedê berî ku tiştekî an jî yekî afirand ma ne yê ku "Xwedayê Hezkirinê" ye, bû? Wê gavê pêşiyê ji kê hez kir? Bi kê re bihevrebûna Wî hebû? Mîna ku me li jorê jî gotine, bersiva vê pirsê, di derûnê yekitiya nuwaze ya Xwedê de, di Xulqa Wî de ye. Ayetên ku em dê bi mînakî bidin, dê vê mijarê ronî bikin.

Demek kurt berî Mesîh bona me biçe mirina darexaçê çavên xwe ber ve ezmanan ve radike û: *"Bavo, bi bilindahiya*



25

*dema berî hebûna dinê, ez li gel te bûm lê xwedîbûm niha min bi cem xwe ve bilind bike... Ji ber ku berî damezirandina dinê te ji min hez kir"* (Yûhena 17:5 û 24). Ji van beşên ku me di Kitêba Pîroz de li ser wan lêkolînê kirine bi eşkereyî tête fêmkirin ku Îsa Mesîh ne mirovekî rêze yî. Tenê bi peyxamberbûna Wî, qasidek, an mamosteyek mezin, an jî yekî nuwazê yê gellek mûcîzetan dike bawer bûn ne bes e. Ew, Xwedayê ku di bedenê de xwe nîşandaye yî. Bona gellekên ku bawer nabin kevirê tilpekîbûnê yî. Bona Cihûyên ku mirina Wî dixwestin kevirê tilpekîbûnê bû. Li gor wan, ew tenê bi xerakirina rêza Şabatê nema, di ser de got Xwedê Bavê min e, bi vê yekê xwe bi Xwedê re kir wekhev. Bo vê yekê xwestin ku Wî bikujin (Yûhena 5:18). Ji waliyê Romî Pîlato kuştina Îsa dixwestin û wisa digotin: *"Zagonek me heye, li gor vê zagona divê Ew bimire. Ji ber ku angaştiya ez Lawê Xwedê me dike"* (Yûhena 19:7) Lê belê Mesîh bi eşkereyî ji wan re: *"Ger hûn bi Ewbûna min bawer nebin, hûn ê di nava gunehê xwe de bimirin"* (Yûhena 8:24) digot. Wê gavê bijartin eşkere yî. Yan dê aliyê Cihûyên ku bi Xwedabûna Mesîh ve bawer nebûne û di nava gunehên xwe de mirine bête girtin, an jî dê bi rastiya ku Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê ye gotiyê bête bawer kirin.

Ev qas ayetên piştgiriyê li Xwedêbûna Mesîh dikin û vê yekê dipeyitînin hene ku, ger em dest bi berhevkirina vana bikin, divê em pirtûkek mezin binivîsînin. Bona babetê bi kurt bikin, tenê em çend mînakan bidin. Peymana Kevin di derbarê Mesîh de bi eşkereyî dibêje: *"Ji ber ku dê ji me re zarokek bizê, dê lawek ji me re bête dayîn. Dê rêvebirî li ser milên Wî be. Dê navê Wî Şîretkirê Nuwaze, Xwedayê Xwurt, Bavê Abadîn, Serokê Xweşiyê be"* (Îşaya 9:5). Di Peymana Nû de jî ji Wî re: *"Xudanê Her Kesî"* (Karên Şagirtan 10:36), *"Xudanê Bilind"* (1.Korintiyan 2:8), *"Ew Xwedayê ku li ser her tiştî serweriyê dajo û heta dawiyê bête pesinandin e!"* (Romiyan 9:5). Nuwazeyên Wî şahdeyiyî li Xwedêbûna Wî dikin. Mesîh Xwedêbûna xwe got û nuwazeyên ku kirin, rastiyên ku digot peyitand. Nexweşan baş kirin, cuzamiyan pak kirin, çavên koran vekirin û miriyan vejînandin. Tevî jin û lawên wan pênc hezar zilamî bi pênc nan û du masiyan ve têr kirin. Ev karê afirandinê bû. Heta Quran jî dibêje ku Wî civîkekê çêkiriye û can daye wê. Jiyan dayîn Xwedêbûn e. Ya din, Mesîh nîşan da ku li ser xwezayê jî serweriyê dajo. Di bahoza li golê de, dema emir li ba û şepêlan kir, bahoz aş bû, der û hêl sekane bû. Li ser avê meşiya û hê gellek mûcîzetan kir. Mesîh tenê bi kirina van mûcîzetan nema, li ser ruhên xerab jî rayedariyê da şagirtên xwe. Bi vî awayî, rayedariya qewirandina ruhê xerab, qenckirina her hebîsî û her nexweşiyê da wan. (Meta 10:1). Şagirtan van mûcîzetan bi navê Mesîh ve kirin, lê belê Wî bi navê xwe ve kir hemiyên vana. Piştî ku Mesîh hilkişiya ezmanan jî, dîsa şagirtên Wî mûcîzetên bi hêza navê Wî qenc kirina nexweşan çêkirin. Dema Pêtrûs ji zilamekî ku ji zayînê ve felc e re: *"Bi navê Mesîh Îsa ve rabe ser pêlan û bimeşe"* got, zilam hema rabû û meşiya (Karên Şagirtan 3:6). Bi rastî navê Îsa Mesîh gellekî nuwaze ye.

Kitêba Pîroz bi taybetî dibêje ku ji bilî Îsa Mesîh di keseki din de xelasî nîne: *"Wekî din di keseki din de xelasî nîne. Di bin vî ezmanî de navêkî din ku ji mirovan re hatiye bexşandin ku bikaribe me xelas bike nîne"* (Karên Şagirtan 4:12). Li cihekî din jî wisa nivîsandiye: *"Hemiyên peyxamberan di derbarê Wî de şahdeyiyê dikin. Wisa ku, li gunehên her kesê ku bi Wî re bawer bûne, bi navê Wî ve tête bexşandin"* (Karên Şagirtan 10:43). Dixwaze bila peyxamber be, dixwaze şandî; ne mimkûne ku di derbarê mirovekî de tiştên wisa bêne gotin. Ne Brahîm, ne Mûsa ne jî peyxamberek din nekarî ji mirovan re: "Ger hûn bi me yekî ve baweriyê bînin dê gunehên we li we bête bexşandin û hûn ê jiyana bêdawî bistînin" bibêje.

Dema ji yên tevî Mesîh li ser darexaçê ne rêbirek li ser darexaçê tobe kir û ji Mesîh xwest ku dema biçe buhuştê wî di bîra xwe de bîne, Mesîh ji Wî re soza: "Tuyê îroj li gel min, di buhuştê de bî" da. Mirovek rêze tu carî nikaribû sozekî wisa bidaya rêbirek li ber mirinê yî. Herî gunehkarê dinê dema baweriyê bi Mesîh ve bîne dê jiyana wî biguhere û şexsiyetek wî yê nû bibe. Ev ji delîl e ku Mesîh tenê ne peyxamber an jî şandiyek e. Bi rastî şandiyan bi xwe jî tesdîq kirin ku ew şagirt û xizmetkarên Mesîh in. Xwedî dê û bavek Xrîstiyan bûyîn, dua baweriyê jiber kirin an jî li dêrê qeydkirî bûyîn mirov nake Xrîstiyan. Hew, kesê ku Îsa Mesîh bi baweriyê bigre dilê xwe dibe Xrîstiyan. Bi vî awayî di mirov de karek xwedanî ya xelasiyê pêk tîne dest pê dike û dizane ku dema jiyana wî li vê dinê dawî bibe, dê here buhuştê.



Nuçeya herî nuwaze ya ji mirovên re gunehkar û zebûnê gunehan e hatiye gotin ev e: *"Ji ber ku Xwedê evqas pirr ji dinê hez kir ku, Lawê xwe yê tekane da; da ku, bila tu kes, ji yên bawerî bi wî bîne helaq nebe, lê bila jiyana wî ya abadîn hebe"* (Yûhena 3:16).

Berî ku ez dawiyê bidim van daxuyaniyan, dixwazim qala nuxtikek gellekî giring e bikim. Mîna ku hê ji berê de jî hatibû dîyar kirin, em dikarin tenê bi navgîniya dilovaniya Xwedê ve xelas bibin; bi vî awayî tu kesê ku baweriyê bi Mesîh re aniye helaq nabe, tenê dibe xwedî bexşandina gunehan û jiyana bêdawî. Kitêba Pîroz dibêje ku, Zagon bi navgîniya Mûsa hate dayîn lê xweşxwazî û rasteqînî bi navgîniya Îsa Mesîh ve hatiye (Yûhena 1:17). Zagona ku ji Mûsa re hate dayîn cezakirinê derpêş dikir. Dida xuyakirin ku her kes gunehkar e û helaqbûnê li xwe heq dike. Lê hew baweriya rasteqîn ya bona Îsa Mesîh, mirov diguherîne û dike mirovek nû. Dîsa Kitêba Pîroz ji me re dibêje ku yê baweriyê bi Îsa Mesîh ve bînin, yanê yê ku Wî bigirin dilê xwe, zayînek ruhanî digirin û didin nîşan kirin ku ew zarokên Xwedê ne. (Yûhena 1: 12, 13). Dilovaniya Xwedê ya ku ji bo me xelasiyê pêktîne, bi me dide hînkirin ku ka em ê jiyaneke çawa bidomînin.

Zilamê ku berê diz e dê çi bibe? Dilovaniya Xwedê hînî wî dike ku, bila êdî dizî neke, lê li dijî wê bi destên xwe bixebite û pere qezenc bike û ger pêdivî hebe alîkariyê bi kesên wekî din re bike. (Efesiyan 4:28).

Dilovaniya Xwedê, a vay, guhertinek wisa dike. Destên dizekî birrîn dilê wî naguhere. Lê belê baweriya bi Îsa Mesîh re vê yekê pêk tîne. Bona gunehên wekî din jî rewş

wisa ye. Bi yê ku bawerî bîne re bi ruhê xwe re, bi bedena xwe re û bi canê xwe re aîdbûna Îsa Mesîh tête hînkirin. Li dêra Korîntê ya ku ji dêrên pêşiyê hatine damezirandin e, mirovên ku berî bawerî anînê jiyanên wan gellekî tirsehêz e hebûn. Pawlos di nameya ku ji wan re nivîsandiye de, ka berê gunehkarên çawabûn di bîr de dianî û *"... Hinekên we wisa bûn; lê belê hûn hatin şuştin, hûn hatin pîroz kirin, bi navê Xudan Îsa Mesîh û bi navgîniya Ruhê Xwedayê me hûn hatin pakkirin"* (1:Korîntiyan 6:11) digot.

Ji ber ku Mesîh gunehkaran qebûl dikir, bi wan re xwarinê dixwar û hînî wan dikir, ji aliyê alimên olê yên Cihûyan hate nirxandin. Ji ber vê yekê Mesîh çîroka lawê wendabûyî ji wan re got: *"Û Îsa got: Du lawên zilamekî hebûn. Û ji vana yê biçûk ji bavê xwe re got: Bavo, ka ji malê xwe wê para ku ji min re dikeve, bide min! Wî malên xwe li wan par kir. Û piştî çend rojan lawê biçûk, her tiştên xwe da hev û çû welatekî dûr û li wir wî bi ewaretî malên xwe tert û belav kir. Û piştî ku wî her tiştên xwe xerc kir, xelayekî dijwar bi ser wî welatî ve hat û ew jî bi xizaniyê ve hayîdar bû û çû xwe li yekî ji gelên wî welatî girt; wî zilamî jî ew şand nav erdên xwe, ber berazan. Û wî dixwest ku zikê xwe bi wê xernûfa ku berazan dixwar, têr bike û kesekî wê nedidayê.*

*Û gava hişê wî hate serê wî, ji xwe re got: Ewqas palên bavê min hene ku, xwarin ji ber wan dimîne û ez dikim li vê derê ji birçîbûnê bimirim! Ez ê rabim, li bavê xwe vegerim û jê re bêjim: Bavo, min li ber te û li dijî ezmên guneh kiriye û ez êdî ne hêja me ku wekî lawê te bême gotin; wek yekî ji paleyên xwe min qebûl bike!*



*Û ew rabû û vegeriya cem bavê xwe. Lê belê gava ew hîn ji dûr ve bû, bavê wî ew dît û dilê wî bi lawê wî şewitî û ew baz da, histuyê wî hembêz kir û ramûsand. Lê belê lawê wî jê re got: Bavo, min li ber te û li dijî ezmên guneh kiriye û ez êdî ne hêja me ku wekî lawê te bême gotin!*

*Lê belê bav, bi vî awayî ji xulamên xwe re got: Bilezînin û herin kincên herî qenc bînin û li wî bikin û gustîlkekê têxin tiliya wî û solan bixin lingên wî û conegayê dermalekirî bînin û serjêkin ku, em bixwin û kêfxweş bibin! Ji ber ku ev lawê min mirî bû û rabû, ew windabûyî bû û hate dîtin. Û wan dest bi kêfxweşiyê kirin"* (Încîl, Lûqa 15:11-24).

Gava Mesîh vê mijarê dibêje xwest ku em dilê Bavê Ezmanî, yê ku kesên poşman dibin û berî didin Wî qebûl dike, binasin. Bavê wî tenê bi qebûlkirina wî nema, cihê wî jî da guhertin, qeftanê qenc li wî kir, golikê qelew da serjêkirin û bi şahî amadekirinê, bi kêfxweşiyê coşiyan. Got ku lawê wî wendayî bû, niha hate dîtin, mirî bû niha vegeriya jiyanê. Îsa Mesîh jî got ku, bona her gunehkarê tobe dike, li ezmanan heman kêfxweşî û şahî dibe. Ya ku divê em fêm bikin ev e: Dilovaniya Xwedê me xelas dike, diguhere û me, bona ku di bêdawîbûnan de bi Wî re bin, amade dike.

*"Ji ber ku xweşxwaziya Xwedê ya ku bona hemî mirovan xelasiyê pêk tîne, derketiye holê. Ev xweşxwazî, bona ku bêxwedêbûn û dilxwaziyên dinyewî red bikin û di çaxa niha de jiyanek bi rastdîtin, rastî û liyaqî rêya Xwedê bidomînin, me perwerde dike. Di vê navberê de, em li bendê ne ku hêviya me ya pîroz bête cih û Xwedayê Pîroz û Xelaskerê me*

*Îsa Mesîh di nava bilindahiyê de werin. Mesîh, bona ku me ji her sûcî xelas bike, pak bike û bike netewek di qencî kirinê de bixîret e û aidî Wî ye, bona me xwe feda kir*" (Tîtûs 2:11-14).



## KURTEBIRÎ

Ev pirtûk, ji qebûl kirina raman an jî fikarek dina pêşkêş dike wêdetir, bona yên ku bidurustî lêkolîna rastiyê dikin, dixwazin hînî rastiyê bibin, lê Kitêba Pîroz bi wan dijwar tê ye, van rasteqîniyên Kelamê fêm bikin hate nivîsandin. Armanca min ne êrişkirina bi baweriya kesekî din an jî serde bûna komek li dijî koma din peyitandin e. Em hemî gunehkar in û em li dijî emirên Xwedê hatin. Bo vê yekê pêdiviya me hemûyan ji dilovaniya Xwedê, ji xelasiya ku bi baweriya ji Wî û ji gotina Wî re pêk tê ve, heye. Xwedê, di Kitêba Pîroz de bi eşkeretî rêya xelasiyê têdigehine. Ji me re, ka dê gunehên me li me çawa bête bexşandin, em dê ji dojehê çawa xelas bibin û dîsa bi ewlekariyê em ê çawa biçin buhuştê, nîşan dide. Bo vê yekê, pêşiyê pêdivî hebe ku em neguhertina Kitêba Pîroz û çawa ku gotina ji Xwedê ve hatiye peyxamgirtin, bipeyitînin. Peyitandina vêya pêwist bû, ji ber heta ku ev nebûya, daxuyanîkirina mijarên din dê bêwate bibûya. Xwedê dixwaze ku hemî mirov xelas bibin û bigihêjin hişmendiya xelasiyê (1. Tîmotêyos 2:4). Ev daxwazya me ye jî. Bi vî awayî ev rîsalet ne bona kesî şikandin, heqaret kirin û li şer gerînê, lê bi fêmkariya hezkirin û dilgermiyê hate nivîsandin. Guhertina ramanên olî karekî cidî û dijwar e; ji ber ku gelên me ji biçûkaniya xwe ve bi van ramanan hatine mezin kirin û di nava demê de ev ray û raman di hundirê me de rehên kûr berdane. Guhertina vana, mîna lebatên bedenê yek bi yek ji cih qetandin an jî hestî ji goşt xeritandin e.

Bi biryarî pêvajoyen bi êşdan e. Lê ya dawîn rastiyê sitendin û nefiroştin her dem ya herî qenc e (Methelokên Silêman 23:23).

Îsa Mesîh dibêje: *"Ger hûn bi gotina min ve girêdayî bimînin, bi rastî ji hûn ê bibin şagirtên min. Hûn ê bi rastiyê bizanibin û dê rastî we azad bike"* (Yûhena 8:31-32).

Gelo Kitêba Pîroz gotina Xwedê ya ewlekar e, an ji di navbera salan de hatiye guhertin û xerabûyî ye?

Gelo Îsa Mesîh bi rastî ji li Golgotayê bi darexaçkirinê ve hatiye şidandin û miriye û roja sêyemîn ji nava miriyan vejiyaye?

Dema kesên Xristiyan di derbarê Yekitiya Sêbêr de diaxifin, dibêjin çi?

Nivîskarê vê pirtûkê piştî gellekî axaftinan, dizane ku Misilman li bersivên van pirsan digerin. Ji ber vê yekê vê mijarê bi kûrahî vedike, lêkolîn û daxuyaniyê dike û dixwaze ku çewt famkirinan ji holê rake û rêya xelasiyê ya ku dibe bêdawîbûnê nîşan bide.

**Niviskar**
A.M.Behnam, Nûjdarê malnişîn. Li Misirê bûyî, li Emerîka dijî. Dr.Behnam li welatê ku maye gotina Xwedê belavkiriye û di temamê dinê de beşdarî gellek civînên Kitêba Pîroz bûye. Axaftinên ku li ser radyo kirine de li gellek welatan têne weşandin.

WWW.GABBERTijd.nl
Koerdisch-Kurmanji
IS VERANDERD
Aan mijn moslim vrienden
ALSO
A.M. Behnam
ENGLISH
kurd.-kurm.